



Di paketa Ecevit de jî kurd nîn in

# Kurd dê mafên xwe bistînin



■ Pakêta aborî ku jî hêla Ecevit ve hate vekirin de jî ji nasnavê gelê kurd re cih tune ye. Gelê kurd jî bi her awayî dixwaze vîn û daxwaza xwe diyar bike. Nûçeyên ku ji çaykaniyên gerîla tîn, diyar dikin ku dê şer gurtir bibe. (Nûçe: R.3)

Nivîskar Mahmut Baksi:




## Ez bengiyê zimanê kurdî me

✓ Her çend min bi hin zimanên din jî pirtûk nivîsîbû jî lê min ew wekî pirtûkên xwe nehesibandin. Ji ber vê çendê ez bengî û evîndarê zimanê kurdî me. Ji bo zimanên din jî rêz û hurmeta min bêdawî ye. Min bi tirkî 8 pirtûk nivîsîn.

✓ Rojnamegerên me berî her tiştî bila kurdiya xwe bi pêş bixin. Bêguman divê em bi erebî, farisî û tirkî binivîsin. Lê dema me xwe wekî rojnamegerekî/e kurd hesiband, em mecbûr in hînê kurdî bibin û pê biaxivin. (Hevpeyvîn: R.8-9)

## Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang.usa.net

SAMI TAN

## Saziyên neteweyî û peywira me

Hemû saziyên neteweyî ji niha pê ve dê zêdetir bibin hedefa êrîşên hêzên dewletê. Divê em jî ji berê baştir bixebitin û saziyên xwe xurtir bikin.

**B**i sarbûna mijara dîlketina Öcalan re, rayedarên dewleta tirk êrîşên xwe yên li ser hedefên din gurtir dikin. Hedefên dewleta tirk dibin du beş: Yên derve û hundir. Li derve bi tenê hiştina girseya kurd, bi gef û bertilan tengkirina çepera li dor kurdên Ewrûpayê ye. Di destpêkê de ji Ewrûpayê wekî terorîst binavkirina PKK û di serî de MED-TV û Özgür Politika girtina saziyên kurdan tê xwestin. Li hundir jî hedefa sereke belavkirina gerîla ye. Ji bilî ve hemû saziyên kurdan hedef in. Hefteya çûyî giştinameyê Wezîrê Dadê yê Tirkiyeyê di çapemeniyê de cih girt. Di vê giştinameyê de hatiye gotin ku hinek kes û sazî bi rîya çandî û weşanê piştewaniya PKK'ê dikin û hatiye xwestin rê li ber vê yekê bê girtin. Ev jî nîşan dide ku piştî ve giştinameyê dê saziyên çand û çapemeniya kurd zêdetir bibin hedefa êrîşên hêzên dewletê.

Jixwe ev demek e hemû saziyên kurd bûne pêgeha polîsan, ji roja ku Öcalan dîl ketiye heta niha gelek navçeyên HADEP'ê pergî cerdên polîsan hatine, di

van cerdan de gelek HADEP'î hatine binçavkirin. Polîs êdî guhên xwe nadine tu pîvanên hiqûqî. Heke kes li sazîyê nîn be jî derî bi alikariya çîlingîran tene vekirin û li hundir lêgerîn tene pêkanîn. Du nimûneyên bi vî rengî hefteya çûyî pêk hatin; polîs bi vî awayî ketin navenda Özgür Halk'ê û HADEP'a Bağcılarê, ev her du cih hatin serobinokirin û gelek ewraqên girîng hatin desteserokirin. Sazîyê ku rastî êrîşên hêzên dewletê hat jî Navenda Çanda Mezopotamyayê bû. Polîsan bi saetan li avahiyên ve sazîyê lêgerîn pêkanîn û piştî 73 kes binçav kirin.

Tiştêkî balkêş jî pirsên ku ji kesên di binçav de tene pirsîn e. Hemû kesên ku hatine binçavkirin bi heman pirsan re rû bi rû mane. Di wan pirsan de li ser dîlketina Öcalan hest û ramanên wan tene pirsîn û di dawîya de jî ji wan tê xwestin ku ew ji Öcalan re bidin çêran. Xuya ye ku hêzên dewletê bi rengî asta dilsoziya wan kesan dipîvin. Reng e ku ew "anket" di pêkanîna polîtîkayên nû yên dewleta tirk de bînan bikaranîn. Li gorî

encama vê lêpîrsînê dê tundiya êrîşa xwe diyar bikin.

Êrîşên li ser HADEP'ê jixwe tene zanîn. Piştî ku doza girtinê hate vekirin, îcar jî dixwazin ku HADEP'ê nexin hilbijartinê. Bi vê daxwazê Serdozgerê Dadgeha Bilind Vural Savaş serî li Dadgeha Qanûna Bîngêhîn da. Dema serlêdanê gelekî balkêş bû. Ev serlêdan piştî ku maweya serlêdana bo berendamiyê kuta bû, pêk hat. Bi vê yekê dewlet dixwaze rê li ber çareseriyên din jî bigire. Lewre tê zanîn ku gelê kurd dê tola hemû zilm û zoraniyên di hilbijartinê de ji dewletê bistîne.

Her wekî li jor jî hate gotin, hemû saziyên neteweyî ji niha pê ve dê zêdetir bibin hedefa êrîşên hêzên dewletê. Li hemberî ve yekê divê berpirs û xebatkârên sazîyan ji berê baştir û birêkûpêktir bixebitin. Di vî warî bar dikeve ser milê her mirovê welatparêz, divê em ji berê zêdetir li sazîyên xwe xwedî derkevin û berhemên wan bixwînin û bidin xwendin.

## Leşkerên APO li ber êrîşê ne

## Ferhengok

ADAR JIYAN

**afret:** jin, pîrek  
**bêhempa:** yekta (essiz)  
**bengî:** mûptela (tutkun)  
**berzebûn:** wind-abûn  
**bextewarî:** mutluluk  
**bihevşabûn:** sevimsek  
**bobelat:** karesat, felaket  
**çêr:** siqêf, dijûn  
**dadger:** hakim  
**dadyane:** adil  
**dagirkin:** îsgalkirin  
**darizandin:** yargilama  
**daxuyanî:** açıklama  
**daxwazname:** dilekçe  
**deng:** oy  
**destûra bîngêhîn:** anayasa  
**dirinde:** hov, wehş  
**doz:** dawa (ülkü)  
**dozger:** savcı  
**dozname:** idianame  
**ewlehî:** güvenlik  
**gefîlxwarin:** hereşe, tehdît

**gencîne:** xezîne  
**girse:** cemawer, kitle  
**hilbijartin:** seçim  
**hilbijêr:** seçmen  
**karîger:** etkili  
**kedkar:** emekçi  
**keslan:** tiral, tembêl  
**lêsobûn:** lêhûrbûn (yoğunlaşmak)  
**lewre:** lewma, ji ber ku  
**mafdarî:** biheq  
**merc:** şert, hoy  
**moşek:** fûze  
**narincok:** el bom-bası  
**nehênî:** weşarî, illegal  
**pakrewan:** şehîd  
**pêvajo:** doman (süreç)  
**pêwîst:** gerek, lazim  
**peyam:** mesaj  
**rewşenbîr:** aydın  
**rojnameger:** gazeteci  
**serpêhatî:** serborî (anı)  
**temen:** jî, emr  
**vêsta:** niha, nika

**P**iştî ku Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan bi kompoyeke navneteweyî hate girtin kurd li çarmedora cihanê rabûn ser piyan. Her wiha li çiya jî gerîla ketin alarmê.

Fermandarên ARGK'ê yên payebilind digel ragihandina girîngbûna rûdanê diyar kir ku divê bi qasî kuliya derziyê moralê kesî xerab nebe, berevajî wê, yekîniyên gerîla ji bo ku şer derxin asta herî bilind amadehiyên xwe bibin serî. Civîn hatin lidarxistin, tevaya gerîlayan hatin agahdarkirin. Her wiha perwerdeya gerîlayan a zivistanê qediyaye. Şervanên azadiyê xwe nû kirine û li benda wezîfeyên xwe ne. Banga Ecevit a bo teslîmbûnê cih bi cih beramberî çêran dimîne. Bi rastî jî Ecevit û berpirsên siyasî û leşkerî yên din li pey xem û xeyalan in. Dîlketina Serok Apo li şûna ku îradeya wan qels bike, daxwaza tohildanê ya şervanên azadiyê bêtir gur kiriye. Gerîlayên ARGK'ê diyar dikin ku serokatiya wan ji bo aşîyê û çareseriyê gelekî hewl daye lê beramberî bêbextî û binvetiyê maye lewre jî kêr gihîştîye heştî. Lewma ne gengaz e mirov ji devê gerîlayekî gotina aşîyê bibihîze. Dema ku mirov li warên şer digere, têdîgihêje ku şideteke şoreşgerî ya gur û xedar ya nedîtî dê dest pê bike. Ger niha bêdengiyek hebe, ji ber mercên xedar yên zivistanê ye.

Û diyar e kî çî biçîne, wê kodika

xwe de bibîne. Serokê PKK'ê dema li Romayê bû di axaftineke xwe ya MED-TV'yê de gotibû li dijî min operasyonê tofanê li dar e, divê em jî bi tofanê bersiva wan bidin. Xuya ye ku sala dawî ya vê sedsalê; 1999 dê bo dewleta tirk bibe sala tofan û afatê. Lewre li ber kurdan tu rîyêke din tune. Tenê dewleta tirk tekane berbersa van rûdanan nayê dîtin, her wiha gerîla Ewrûpayê jî wekî hevparê ve kompoyan dinirxîne. Heta Konseya Seroka-

**Dema ku mirov li warên şer digere, têdîgihêje ku şideteke şoreşgerî ya gur û xedar ya nedîtî dê dest pê bike. Ger niha bêdengiyek hebe ji ber mercên xedar yên zivistanê ye.**

tiyê ya PKK'ê di daxuyaniya xwe ya 18'ê reşemiyê de serokwezîrê Yewnanistanê Simitis û Wezîrê Karê Derve Pangalos wekî dijmin îlan kir. Kesên ku PKK'ê hinekî dinasin, dizanin ku ew biryarên ku girtine di dawîya dawîn de pêk tîne.

Bi rastî diyar e ku hêzên di vê girtinê de berpirsîn, digel tecrûbe û agahiyên xwe jî kadro û girseya PKK'ê baş nas nakin. Ji wan wetnê (tirî) ku bi girtina serkêşên PKK'ê di serî gerîla dê hemû rêxistinê taswiye bikin, lê ev xwe xapandin e. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan partî wisa mezin û berfireh kiriye ku şax û zilên wê xwe gihandi-

ne her derê, lewre jî merhaleya têkçûnê gelekî li paş xwe hiştîye. Dibe ku di salên 80'yî de mimkûn bûya lê piştî ve kêliyê ne mimkûn e. Mirov dema reaksiyonên gelê kurd ên ku li dijî girtina serokatiya xwe nîşan dide, raçav bike ev rastî berbiçavtir dibe. Digel çarmedora cihanê li başûr û rojhilatê Kurdistanê jî tevgera gel a mezin dest pê kir.

Ji Silêmaniyê hetanî Ürmîyê li başûr û rojhilatê Kurdistanê bi deh hezaran kurdistanî bi heman hest û ramanan di dîrokê de yekemîn car e meşandin, çalakî li dar xistin.

Li aliyekî li Başûr xwepêşandanên gel pêl bi pêl mezin dibin, li aliyê din bi dehan ciwanên Başûrî tevî nav refên ARGK'ê dibin. Ecevit belaser xwe diçirine. Leşkerên Apo wiha bersiva wî didin: "Li benda me bin, emê di demeke kurt de bersiva te û dijminên din ên kurdan û PKK'ê bidin."

Gerîla û gel çalakiyên xwefedayî jî di nav de ji bo çalakiyan serî li fermandarên ARGK'ê didin. Peyamên şifreyî û ferman zêde dibin.

Bêguman rêveberiya PKK'ê ARGK'ê alîgirê çalakiyên hestiyar û bêrêxistin nîn e. Înisyatîfêke mezin daye gel û gerîla, lê diyar dike ku şerê esasî dê bi plan û rêxistinî be. Li ser vê bîngêhê li ser hemû rêxistinên siyasî û leşkerî serdest e. Li Îmraliyê dîlûna serokatiyê ve rastiyê naguherîne.

Bi hezaran gerîla her çiqas girtîbe jî ji Serok Apo fermana xwe girtiye. Leşkerên Apo ji bo destpêkirin tofana mezin amade ne.

Di paketa Ecevit de jî kurd nîn in

# Kurd dê mafên xwe bistînin

Agahiyên ku ji çavkaniyên gerîla û berpîrsên PKK'ê bi dest dikevin nîşan didin ku dê gelê kurd êdî mafên xwe bi destê xwe bistîne. Bo nimûne Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Öcalan roja 2'yê adarê bi riya telefonê beşdarî bernameyeke ke MED-TV'yê bû û da zanîn ku ew dê êdî bo aşî û azadiyê li deriyê kesî nedin û ew dê mafên xwe bi darê zorê ji dewleta tirk bistînin.



Parêzerê Öcalan Okçuoğlu, da zanîn ku dewlet dixwaze Öcalan ji holê rake.

Parêzerên Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan roja 25'ê reşemiyê bi Öcalan re hevdîtinek pêk anî. Parêzer A. Zeki Okçuoğlu û Hatice Korkut berî hevdîtinê û piştî hevdîtinê rastî êrişên komikên faşist hatin. Parêzerên Öcalan roja 26'ê reşemiyê li Muzexaneyê Çapemeniyê ya Stenbolê civîneke çapemeniyê li dar xist.

Daxuyaniya nivîskî ji hêla Okçuoğlu ve hate xwendin. Okçuoğlu berî xwendina daxuyaniya nivîskî da zanîn ku ew bûne hedefa komikên nijadperest ên ku ji hêla polisên sivil ve tene fitkirin û birêxistinkirin. Di daxuyaniya nivîskî ya li ser hevdîtinê de jî hate gotin ku Öcalan bi komployeke mezin re rû bi rû ye. Li gorî gotina parêzeran dewlet dixwaze Öcalan di demeke kurt bi dar ve bike. Her wiha hate daxuyandin ku dibe dewlet bi cînayeteke di dilqê întixarê de jî Öcalan ji holê rake. Di daxuyaniyê de hate gotin ku hevdîtin di mercên ne baş, li pêşberî du kesên bi maske de pêk hatîye û lewma di hevdîtina ku bîst deqîqe dom kiriye de wan nekariye bi muwekilê xwe re tiştêkî bipeyivin. Dîsa hate diyarkirin ku maweya hevdîtinê ji hêla leşkeran ve bi bîst deqîqeyan hatiye sînokirin.

## Komplot destkirê kê ye?

Piştî çapemeniya kurd û çapemeniya cîhanê çapemeniya tirk jî li xwe mikur hat û hate gotin ku di dîlgirtina Öcalan de rola sereke ya Amerîkayê ye. Bo nimûne di hejmara heftiya çûyî ya kovara Aktuel de nivîsek li ser vî mijarê hate weşandin. Di vî nivîsê de tê gotin ku Ecevit girtina Öcalan wekî bazareke du-alî ya Tirkîye û Amerîkayê bi nav kiriye. Beramberî Öcalan dê Tirkîye çî bide Amerîkayê ew yek jî hatiye ravekirin. Dê Tirkîye li dijî politîkayên Amerîkayê yê li Iraqê dernekeve, di Kêşeya Kibrisê de helwesta xwe nermtir bike. Li vir jî sedema helwesta Yewnanîstanê diyar dibe. Lê daxuyani û tevgerên dewleta

tirk ên demên dawîn tiştêkî din nîşan dide. Piştî komploya li hemberî Öcalan rayedarên dewletê li Yewnanîstanê gefên şer xwarin. Li gorî nirxandina stratejîstan Yewnanîstan hê nehatiye ser xeta ku împeryalist dixwazin. Lewre gelê yewnan li hemberî vî rola hikûmetê radibe û piştevaniya gelê kurd dike. Heman kes didin zanîn ku Amerîka û Tirkîye dixwazin ku Yewnanîstan PKK'ê wekî terorîst bi nav bike, da ku ew jî di Kêşeya Kibrisê de daxwaza Yewnanîstanê pêk bînin. Lê di serî de gelê Kibrisê, gelê yewnan li dijî çareserîyeke bi vî rengî derdikeve.

Kesên ku li ser vî mijarê dahûrandinan dikin, balê dikişînin ser tîkiliya vî komployê ya digel Peymana Washingtonê, politîkayên Amerîkayê yê li ser başûrê Kurdistanê û Iraqê û piştî dibêjin ku ev komplot bi tenê kurdan hedef nagire, hemû gelên Rojhilata Navîn hedef digire.

## Dê kî bê darizandin?

Bi dîlketina Öcalan re gengeşiyên li ser pergala hiqûqa tirk û awayê darizandina li Tirkîyeyê jî gur bûn. Şewirmendên dewletê diyar dikin ku heke Öcalan li DGM'yan bê darizandin, dê Tirkîye li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê bê darizandin û cezakin. Pergala hiqûqî ya dewleta tirk ew li pêşberî Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê xistiye rewşa bersûcê herî mezin. Li dadgeha navborî 1924 dozên ku li dijî wê hatine vekirin, Tirkîye di rêza yekemîn a bersûcan de ye. Ji wan dozan 109 doz bo bînpêkirina mafê jiyane, 129 doz bo bînpêkirina mafê ewletiya kesan, 106 dozên îşkenceyê, 232 dozên bînpêkirina mafê derbirina ramana siyasî û olî. Kesên ku berê di vî dadgehê de parêzeriya dewletê kirine û gelek kesên din dixwazin ku ji DGM'yê dadgerê leşkerî bê vekîşandin, lê ji bo vî yekê guhartina qanûnê pêwîst e. Li aliyê din sazîyên demokratîk didin zanîn ku dewleta tirk nikare Ö-

calan bidarizîne, lewre jî divê bo darizandina Öcalan dadgeheke navneteweyî bê lidarxistin. Helwesta Yekîtiya Ewropayê ku wekî hevkarê komployê tê destnîşankirin jî bi şeweyekî din e. Ew jî dixwazin hinek çavdêran bişînin dadgeha ku dê Öcalan lê bê darizandin. Lê rayedarên dewleta tirk vî yekê bi tundî red dikin. Dewleta tirk dixwaze Öcalan wekî sûcdarekî adlî bidarizîne, gotinên Serokomarê Tirkîyeyê Demirel ên bi rengê "Öcalan ji ber ku kurd e nayê darizandin, ji bo ku wî mirov kuştine tê darizandin" vî yekê nîşan didin. Kesên ku komplot birine serî, bi psîkolojiya hêzeke serkeftî tevdişînin, lewre jî gotinên Yekîtiya Ewropayê yê bi rengê "Kêşeya Kurd bi awayekî demokratîk çareser bikin" qet li ber çavan nagirin û ew hinek mercan dafînin ber dewletên ewropî. Ev gotinên Mûstefaşarê Wezîrê Karê Derve yê Tirkîyeyê Korkmaz Haktanîr ve rastîyê destnîşan dikin:

1) Li hemberî PKK'ê piştîgiriya me bikin, PKK'ê şermezar bikin.

2) Kêşeya Kurd wekî merc daneynin ber me.

3) Di Kêşeya Kurd de tiştê ku ez dixwazim, ez dê bikim. Li gorî plana xwe û li gorî dil kengê ez pêwîst bibînim ezê bikim. Tu nikarî tîkîlî min bibî.

Li hemberî vî yekê, çalakiyên kurdan ên li seranserê cîhanê jî nîşan didin ku, dê gelê kurd bi tu awayî teslîmîyetê nepejirîne û ji bo mafên xwe yê demokratîk tîkoşîna xwe xurtir bike. Agahiyên ku ji çavkaniyên gerîla û berpîrsên PKK'ê bi dest dikevin jî vî yekê nîşan didin. Bo nimûne, Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Osman Öcalan roja 2'yê adarê bi riya telefonê beşdarî bernameyeke MED-TV'yê bû û da zanîn ku ew dê êdî bo aşî û azadiyê li deriyê kesî nedin û ew dê mafên xwe bi darê zorê ji dewleta tirk bistînin.

## Paketa Ecevit

Wekî gelek hikûmetên din hikûmeta Ecevit jî paketeke aborî vekir. Pêşî hatibû daxuyandin ku ew paket li Kurdistanê bê vekirin. Lê li gorî nûçeyên ku di rojnameyên tirk de derketine, Waliyê Rêveberiya Ne-asayî ji Ecevit tîka kiriye ku neçe herêmê, lewre ihtîmal hinek çalakiyên heyê. Li ser vî yekê Ecevit paketa xwe li Enqereyê vekir. Li gorî daxuyaniya Ecevit, 40.5 trilyon ji bo vî paketê hatiye terxankirin û 120 hezar kes dê bi vî paketê bibe xwedî kar. Lê gelê kurd deynin aliyekî, paketê hevî neda rojnamegerên tirk jî, gelek şik û gumana xwe li ser raporê anîn ser zimên û hate gotin ku kêşe bi vî rengî çareser nabe.

Derdorên bi mijarê re tîkildar didin zanîn ku mîna paketên din di paketa Ecevit de jî cih jî gelê kurd û nasnavê wî re tune. Ew kes vî helwesta Ecevit bi daxwaza dewletê ya ji bo girtina HADEP'ê ve girê didin. Li gorî nirxandina wan kesan, ji ber ku dê HADEP vî û daxwaza gelê kurd li ber çavên cîhanê raxe, dewlet naxwaze ku HADEP beşdarî hîlbijartînan bibe.

NAVENDA NÛÇEYAN

# Kurd li tora berjewendiyên navneteweyî asê bûn

Di komploya ku li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hate lidarxistin de lihevhatina berjewendiyên navneteweyî heye. Her wiha rekabeta hin dewletên kapitalîst û qeyrana hin welatan di komploya de diyarker in. Ev komplo di kesayetiya Abdullah Öcalan de li dijî hemû gel û çînen bindest hatiye lidarxistin.

**K**omploya ku li dijî Serokê PKK'ê hate lidarxistin digel gelê kurd çarenûsa gelên Rojhilata Navîn û çînen bindest jî eleqeder dike. Dîsa rekabeta dewletên kapitalîst, qeyrana aborî ya hinek dewletan û pergala cihanê ya di bin piyê împeryalîstan de eleqedar dike. Rûdanên wê dawiyê ne tenê karê dewletê ne. Berjewendiyên pergala kapitalîst di komploya li dijî Serokê PKK'ê de diyarker in. Lê hinek hêz li gorî yên din bi roleke mezin rabûne.

## Sûriye

Li Rojhilata Navîn xwedî hêzeke leşkerî ye. Cîranê du hêzên mezin; Îsraîl û Tirkîyê ye. Nakokiyên Sûriyê bi wan re hene. Li hemberî êrişên siyonîzmê, parastina Girên Golan û Çemê Asî bi Îsraîlê re di nav nakokiyê de ye. Her wiha li ser bajarê Hatayê û Çemê Ferat bi Tirkîyê re xwedî pirsgirêk e. Lê bi serê xwe hêza wê ya ku pêka dewletên navborî bîne, tune.

Ji ber van sedeman hebûna PKK'ê bi kêrî Sûriyê dihat. 1) PKK bi bîrdozya xwe li dijî siyonîzmê û bi hêza xwe ya leşkerî ve jî li dijî Tirkîyê têdikoşe. 2) Diravên PKK'ê di bankayên Sûriyê de bûn. Ji hêla aborî ve bi kêrî Sûriyê dihat. Lê bêtir pêşketin û xurtbûna PKK'ê ew tirsand. Lewre jî ji ber xetera rewşê helwesta xwe guherand. Sûriyeya ku li Amerîka û Tirkîye guhdarî nedikir îcar ev yek ji xwe re kire hincet li serokê gelê kurd xwedî dermeket.

## Rûsya

Naveroka politikaya PKK'ê bêhtir bi kêrî Rûsyayê dihat. Di Rojhilata Navîn de li ber împeryalîzma Amerîkayê asteng bû. Ji ber wê Amerîkaya ku nikaribe Rojhilat bi hêsanî kontrol bike, nikare Qafqasya, Asyaya Navîn, Baltik û Balkanan jî kontrol bike. Ev herêman berê di bin destê Sovyetê de bûn. Îro jî ji bo parvekirina împeryalîstan bûne herêman dewlemendiyên sererd û binerdî. Hebûna PKK'ê hem planên Amerîka û Tirkîyê ser û bin dîkir, hem jî rîya Rûsya, Îran û Almanyayê vedikir. Ev dewlet bêserêşî diketine nav van herêman.

Xêncî van nîfta li Qafqasyayê û Kazakistanê jî bo împeryalîstan bû sedema rekabetê. Xêncî van qeyrana aborî Rûsya rapêçand. Rûsya jî bo wê gelek berjewendiyên xwe dan aliyekî. Çimkî ji ber hewcedariya pereyê IMF'ê, pêşveçûna tekiliyên bazirganî pêwîst bû ku ji qeyranê derkeve. Li ser wê: 1) Rûsyayê dev ji daxwazên xwe yên ji bo Bakû Cey-

hanê, 2) Ji herêma Rojhilata Navîn, 3) Avakirina baregeha li Ermenîstanê berda.

Her çiqasî Dûmayê pejirandibe jî redkirina statûya siyasî ya serokê gelê Kurd girêdayî van sedeman e. Rûsyayê di wê pêvajoyê de berjewendiyên xwe yên stratejîk wînd kirin. Tenê pereyên ji IMF'yê, pereyên S-300'an, xeta lûleyên Kazakistanê (ku ev jî hê ne diyar e) razî bû. Bi vî awayî jî bo demeke kurt belkî xwe ji qeyranê xelas bike, lê di demeke dûvedirêj de azadiya xwe ye aborî, ramiyarî û leşkerî wînda dike. Bi navîkê ve bi împeryalîzmê tê girêdan.

## Yewnanîstan

Bi Tirkîyê re pirsgirêkên wê yên bingehîn hene: 1) Kîbrîs, 2) Giravên E-

geyê, 3) Xwedîtiya ava Deryaya Egeyê, 4) Lêgerîna nefta di bin deryayê de, 5) Hêza leşkerî ya Tirkîyê, 6) Pirsgirêka tirkên Yewnanîstanê û rûmên li Tirkîyê... Ji bo parastina van berjewendiyên hebûna PKK'ê bi kêrî Yewnanîstanê dihat. Dîsa ji ber çalakiyên PKK'ê û helwesta Tirkîyê tûrist li şûna ku bihatana Tirkîyê diçûne Yewnanîstanê. Ev yek ji hêla aborî ve gelekî bi kêrî wê dihat.

Ji ber van sedeman tîkiliya yewnanan bi kurdan re bi pêş ket. Lê çiqasî dostanî bû an jî li ser berjewendiyên rojane û bi çûyîna Serok re ronahî bû. Di encamê de Yewnanîstan jî beşdarî komploya li dijî Serokê gelê kurd bû. Li gorî hinek gotinan jî bo fuzeyên S-300 û Kîbrîsê soz girtiye. Lê xuya ye ku eger

tiştêkî wiha hebe jî Tirkîye bi cih nayne. Fen û fûtên Tirkîye û Amerîkayê berjewendiyên Yewnanîstanê kiriyê xeterê. Rêveberên Yewnanîstanê hem li hemberî kurdan durûtiya xwe daye da hem jî firsendên di destên xwe de bi avê de birine. Rastkirina wê bi îstifakirina çend wezîran ne gengaz e. Eger bi awayekî rast û durist li kurdan xwedî derkeve dikare careke din van derfetan bi dest bixe. Ger wisa neke windayiyên wê mezin in. Ji bo wê jî karê wê ne hêsan e. Divê li hemberî êrişên Tirkîyê bisekinne. Her wiha jî bo kurdan di Yekîtiya Ewropayê de bi awayekî rasteqînî bixebite

## Ewropa

Dewletên Ewropayê liv û lebata xwe bi taybetî li ser bingeha berjewendiyên aborî dimeşînin. Pirsgirêkên leşkerî û siyasî ji Amerîkayê re hiştine. Li hemberî hêza Amerîkayê serê xwe tewandine û li pey wê dimeşînin. Eger nakokiyên wan hebin jî, bi taybetî di warê aborî de ne.

Li gorî wê tîkiliyên xwe yên siyasî bi bêbiryarî û nîvco datînin. Bi kurdan re jî bi vî rengî meşîyan. Hem li ber kurdan rê negirtin û hem jî venekirin. Wan xwest hem bi mîlîtarîzma tirk re hem jî bi şoreşa kurdan re bimeşînin. Daxwaza wan a sereke firotiya çekan, tîkiliyên bazirganî û parastina berjewendiyên aborî bû. Bo nimûne; Îngilîstan jî bo berjewendiyên xwe yên aborî xeta lûleyê ya Bakû-Ceyhanê naxwaze. Ji ber wê hebûna PKK'ê bi kêrî Îngilîstanê tê lewre jî kompaniyaya MED-TV'ê diparêze. Lê di hêla siyasî de li ser şopa Amerîkayê ye, nahêle PKK pêş ve here û qedexeyê kiriyê. Almanyayê jî bo ku çekan bifiroşe Tirkîyê û jî bo malên aborî PKK qedexeyê kiriyê. Lê ji ber berxwedana kurdan jî nikare van rêz û rêçikên xwe têxe jiyane. Bi taybetî bi çûyîna Serokatiyê ya Ewropayê re ev durûtiya wê eşkeretir bû. Hem jî bo darizandinê serokatî qebûl nekir hem jî ji bo çareseriyê gavek neavêt.

Fransa heta jê tê xwe dîr digire. Li aliyekî qedexeyên wê hene li aliyê din jî alîkariya wê heye. Ji bo çareserkirina kêşeya kurdî gaveke berbiçav neavêtîye. Îtalyayê jî aliyê hersê welatên navborî ve jî alîkarî nedît. Her wiha di civînên Parlamentoya Ewropayê de gaveke rasteqînî nehate avêtin.

(Dê bidome)



Pablo Pícasso qefesa çûkan

# Hinek qertafên kurdî

Hefteya çûyî di vê rûpelê de li ser girîngiya qertafên ku pê peyvên nû çêdibin hatibû rawestandî. Vê hefteyê li ser nivîseke Baran Rizgar ku ji rûpeleke internetê hatiye wergristin, dê digel hinek têbiniyan were rawestandî. Qertafên li xwarê ji wê nivîsê dê rasterê bêne girtin û dîtin û raman dê wekî têbiniwerin pêşkêşkin.

-ahî ji rengdêr navdêrê çêdike.

Mînak: ji ron ronahî

-ajo ji navdêrê navdêrê çêdike

Mînak: kerajo

Têbini: Ev qertaf her wekî diyar e, raya (kok) dema niha ya lêkera avêtin e. Dirûvê resen ê vê lekerê havêjtin e, lewre jî raya wê ya dema niha wekî "ajo" derdikeve pêşberî mirov. Hinek mînakên din ên bi vî rengî hene. Her wiha raya dema borî ya hinek lêkerên din jî wekî paşgir tê bikaranîn. Wekî ji firotinê malfiros, agahîfiros û hwd.

-an pirjimarî (awayê tewandî)

Mînak:

Keçan

-an rengdêra jimarî rîz dîke.

Mînak:

Çaran

Têbini: /-an/ qertafa tewanga pirjimarî ye, lewre jî mirov nikare wekî paşgir an jî pêşgir hilde dest. Ev qertaf cînavk û navdêrên tewandî yê pirjimar pêk tîne. Mînak: "Hevalan got.", "Wan got."

-ane ji rengdêr û navdêran rengdêrê

çêdike

mînak: Merdane

-andin ji rengdêran lêkerên sedemî pêk tîne

mînak: avisandin

Têbini: Ev paşgir ji navdêr û rengdêran lêkerên gerguhez pêk tîne. Her wiha hinek peyvên biyanî bi vî rengî dirûvekî kurdî digirin. Bo nimûne elimandin, binyata raya vê peyvê ilma erebî ye. Lê ew cihê hinkirin û fêrkirina kurdî digire.

-ayetî ji navdêran navdêreke din pêk tîne.

Mînak: kurdayetî

Têbini: Ji navdêrên şenber têgîneke razber pêk tîne. Mirov dikare di vî warî de çend mînakên din jî bide, wekî: birayetî, mirovayetî û hwd.

-avahî ji navdêrê navdêreke din pêk tîne û wateya /-ization/a îngilîzî dide peyvê.

Mînak: bajaravahî (urbanization, şehirleşme)

ba-

Mînak: badan

-bar ji navdêrê rengdêr pêk tîne, cihê /-full/a îngilîzî digire.

Mînak: gunehbar (sinful)

bala- jor

Mînak: balafir

Têbini: Bala peyveke serbixwe ye û wateya wê ya rastîn bilind e. Lê wateya wê ya bingehîn hatiye jibîrkirin, bi tenê wekî pêşgir di zimên de hebûna xwe parastîye.

ban- ûltra

Mînak: banwenew bi soranî tê wateya tişkên "ultaviolet"

Têbini: Ev peyva li jor têkildarî peyva ban (xanî) û "banî"ya kurmançî ye. Her wiha /-ban/ wekî paşgir jî di kurdî de heye, ew jî lêkera pan tê. Ev paşgir di peyva mazûban de derdikeve pêşberî mirov. Ji kurdî zêdetir di farisî de ev paşgir tê bikaranîn. Wekî "baxban" ku di tirkî de jî tê bikaranîn. Hemwateya wê paşgirê di kurdî de /-van/ e.

-baran ji navdêr navdêreke din pêk tîne.

Mînak: Bombebaran

Têbini: Baran peyveke bi serê xwe ye, lê her wekî di mînaka li jor de diyar e bi karekî din jî radibe. Mirov dikare ji bo sayîkirina mijarê mînaka gulbaran jî bide.

bav

Mînak: bavpîr

Têbini: Li vî derê peyveke hevedudanî heye, lewre jî mirov bi tu awayî nikare peyva bav wekî qertaf bibîne. Mînakên bi vî rengî di kurdî pir in, peyva herî nêzik dapîr ku ji dê û pîrwê tê.

-baz ji navdêr rengdêrê pêk tîne.

Mînak: agirbaz

-bazî ji navdêrê navdêreke din pêk tîne.

Mînak: agirbazî

Têbini: Her wekî ji mînakan jî diyar e, her du paşgir ji heman binyatê tî.

Her du ji têkildarî lêkera bazdan û bezînê ne. Di mînaka duyemîn de ji rengdêrê navdêr hatiye afirandin. Mirovê dikare bo vî paşgirê mînakên wekî fêlbaz, zorbaz jî bide.

(...)

bed- xerab

Mînak: bedbext (bext xerab)

Têbini: Wateya rastîn a vî peyvê jî hatiye jibîrkirin û ev peyv di çend mînakan de wekî pêşgir derdikeve pêşberî mirov. Mînakeke din jî peyva "bedbîn" e ku tê wateya "karamsar" a tirkî.

(...)

- bend: sînor, çeper

Têbini: Ev peyv hem wekî pêşgir û hem jî wekî paşgir tê bikaranîn. Di bingeha xwe de bend têkildarî "ben" a kurmançî ye. wekî pêşgir mirov dikare mînaka "bendav"ê bide. Lê di kurdîya kevn de wekî paşgir tê bikaranîn. Mînaka herî berbiçav peyva "nabend" e.

ber- bergeh, dij

Mînak: berjêr

Têbini: Peyva "ber" di kurdî de xwediyê gelek wateyan e. Her wiha wekî pêşgir jî tê bikaranîn. Lê li vî derê jî pêşgirê wêdetir, hoker e û alî nîşan dide. Digel berjêr hokereke nû pêk aniye. Lê mirov dikare ji bo "ber" a pêşgir mînakên mîna: bersûc, berkar û berpîrs bide.

AMADEKAR: SAMÎ BERBANG

## Firsendên çareserkirinê

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Dema ku gelek koçberên kurd hatin Ewrûpayê firsendeke mezin ketibû destê ewrûpiyan. Ji ber ku sedema hatina koçberan te divê bila siyasî be, te divê bila aborî be, sedema sereke rewşa Kurdistanê bû. Kurd ji ber rewşa Kurdistanê û êrişên hovane yê tirkîan direvîyan.

Ewrûpa ji vî yekê aciz dibû. Rast e, mafdar bûn, demografiya wan dihate guhartin. Wan welatê xwe ji bo xwe ava kiribû. Jiyana wan, rewşa wan a civakî dihate guhartin. Niha jî hatina kurdistanîyan ranewestiyaye. Ev firsendeke mezin bû ji bo çareserkirina pirsgerînga kurd. Lê mixabin niha jî Ewrûpa vî firsendê bi kar nayîne. Li şûna tawanbarkirina dewleta tirkî, li şûna çareserkirina kêşeya kurd, kurdan tawanbar dîke. Ev helwesta wan jî dibe sedema dijwarbûna pirsgerînga kurd.

Firsenda duyemîn hatina Öcalan ya bo Romayê bû. Öcalan hemû gotin û peyamên xwe li ser konferanseke navneteweyî ya kurd, li ser siyaseta legal a PKK'ê û li ser pejirandina rewşa wî ya siyasî ava kiribû. Mirov dikare bibêje ew ji bo darizandîneke navneteweyî jî amade bû. Ji ber ku di dadgeheke navneteweyî de kêşeya kurd û rewşa dewleta tirkî dê bihata niqaşkin. Ew jî rîyeke dîrokî bû ji bo çareserkirina pirsgerînga kurd.

Sêyemîn firsend girtina Öcalan e. Ew bûyer ji bo kurdan windahiyeke mezin e. Lê ji bo çareserîya kêşeya kurd jî firsendek e. Lê belê ewrûpî dema xwe li ser çalakîyên kurdan diborînin. Mafdariya kurdan bibînin jî car caran li dijî çalakîyan derdikevin. An jî di hemû peyamên xwe de dixwazin ku çalakî bêne rawestandî.

Tiştê herî balkêş ew e ku ewrûpî êrişên li ser kurdan û dilsojiya wan nabînin. Polisên cihû li Berlînê çar kurd kuştin. Kesî ew terorîstî şermezar nekir. An jî hinekan şermezarkirîneke sist nîşanî raya giştî da. Her wekî bîdengîya hemû terorîstîyên Îsraîlê yê li cihanê û helwesta alema demokrat.

Çalakîyên kurdan ên dilsoj û biçûk, bûn sedemên êrişên hovane yê dagirkeran. Li rojhilatê Kurdistanê gelek welatparêz hatine kuştin. Dîsa li bakurê Kurdistanê gelek welatparêz hatin kuştin û girtin. Raya giştî ya navneteweyî her dem qala wan çalakîyan dîke. Lê qala hovîtiya dagirkeran dîsa berze ye. Ya herî balkêş li başûrê Kurdistanê li Silêmanîyê astengiyên YNK'ê ne. Em kuştin, girtin, an jî mudaxleya li Rojhilat, li Bakur fêma dikin. Lewre Îran û Tirkîye dagirker in. Lê êrişên Yekîtiya Nîştîmanî Kurdistan yê li ser çalakîyan tê çî wateyê? Ma ew nizanin heke Öcalan bibê taştîya dijmin, ewê jî bibin firavîn?

Dîsa jî hêviyek heye ku piştî girtina birêz Öcalan di qada navneteweyî de li ser çareserkirina kêşeya kurd hinek xebat hebin. Piştî hîlbijartinê li Tirkîyê bawer dikim ku ew hewldan dê zêde bibin. Lê ew jî bi du mercan ve girêdayî ye.

Yek, çalakîyên leşkerî yê şervanan û artêşa tirkî li Kurdistan û Tirkîyê. Du, xebatên siyasî û demokratîk li derveyî welêt (li Ewrûpa û hemû welatên ku kurd lê dijîn).

Du dilxwazên azadiyê:

# Nihat û Ferhan Kavri

**D**i dîroka şoreşa Kurdistanê de gelek malbatan du sê zarokên xwe şandine nav refên gerîla û hê jî dişinin. Ji van malbatan yek jî li Mêrdînê li gundê Mûsika malbata Xalê Remo (Ramazan Kavri) ye. Du lawên Xalê Remo, Nihat û Ferhan ketina nav refên pakrewanên şoreşa Kurdistanê. Em li ser jiyana û şoreşgeriya Nihat û Ferhan Kavri, bi birayê wî Şakir Kavri re axivîn. Em vê kurtehevpeyvînê pêşkêş dikin.


*Hûn dikarin li ser jiyana birayên xwe û beşdariyan wan a bo refên gerîla me agahdar bikin?*

Di serî de ez dixwazim behsa birayên xwe yên mezin Nihat bikim. Wekî piraniya malbatên kurd malbata me jî malbateke xizan û hejar bû. Nihat, dema kete 7 saliya xwe li dibistana mecanî (yatılı) dest bi dibistanê kir. Ev dibistan, her çend cih û warê asimilasyonê bûn jî, tesîreke mezin li Nihat nekiribûn. Xwendekarekî jîr û zana bû û her dem li dijî neheqî û zordariyê radibû. Di nava civak û dibistanê de hezkiriyên wî gelek bûn û her kesî qedrê wî digirt.

Nihat, li pey qedandina dibistana navîn dest bi lîseyaya mamostatiyê kir. Dema li lîseyê bû, salên 1978-1979, pêşengiya hêzên şoreşger dikir. Dû re Darbeya 12 Rezberê li dar ket. Li pey Darbeyê di sala 1983'yan de dest bi mamostatiyê kir û wê demê bi gerîlayan re têkilî danî. Dawiyê di sala 1984'an de tevî nav refên gerîla bû.

Piştî ku Nihat tevî refên gerîla bû, me der barê wî de tu agahî wernegirt. Dawiyê me bihîst ku, li Dêrika Çiyayê Mazi li Girêsorê, tevî 7 hevalên xwe tevî refên pakrewanan bûye.

Li pey şehîdketina Nihat, birayê me Ferhan di sala 1992'yan de gihîşt nav refên gerîla. Ferhan dema gihîşt nav refên gerîla 18 salî bû. Ew, di roja 20'ê tîrmehê sala 1998'an de li



Nihat (milê çepê) û Ferhan Kavri, birayên hev in. Pêşin Nihat, piştî jî Ferhan tevî refên gerîla dibin. Ferhan di 1998'an de li Tokatê şehîd dikeve.

Tokatê gihîşt refên pakrewanan.

*Dema we xebera şehadeta birayên xwe wergirt, hestên çawa li we peyda bûn?*

Malbata me şehadeta wan bi serbilindî pêşwazî kir. Li ba me serbilindiya herî mezin e. Wan ji bo mirovahiyê û jiyaneke bi rûmet canê xwe feda kir. Wezîfeya me ew e ku, em bidin ser doz û rîya wan. Dijmin cenazeyê her du birayên me jî nedan me. Lê ji bo me ne xem e. Lewre ew di nava dilê me de veşartî ne.

*Çêbû. Zilm û zordarî li malbata we tê kirin?*

Di dema şehadeta wan de gelek gef li me xwarin. Her wiha ji bo ku em li cenazeyê wan xwedî dernekevin, gelek tade li me kirin. Lê aniha zordarî û êrîşên ku li gelê kurd tene kirin, li me jî dikin. Li vê derê wekî hûn pê zanin, malbatên şehîd, gerîla û dilên şer hene. Rewşa me bi tenê ne wilo ye.

## Jiyaneke mişt rûmet: Musa Torun

**E**z û du hevalên xwe li TAYDER'a İzmirê (Komeleya Malbatên Girtiyên) rûniştibûn. Piştî demekê berpirsiyarê komeleya got: "Hûn pê zanin wê aniha kî were vê derê? Girtiyekî ku ji ber nexweşiya rîşê (kanser) serbest hatiye berdan, Musa Torun dê were." Me gelek caran di rojname û kovaran de navê wî bihîstibû. Ji ber vê çendê me xwest em xwediyê vê jiyana bi rûmet binasin.

Li saet duduyan me dît hat. Mirovekî bi qîlafetê xwe gir bû. Yek bi yek bi destê me girt û em hembêz kirin. Heta zarokên hûr û yên li ber destê diya xwe, yek bi yek hembêz û maçî kir. Bi zorê dipeyvî, hêdî hêdî...hebo hebo. Ji ber ku kezeba wî hatibû jêkirin, bêhna wî jî bi teqla derdiket. Carina disekinî û dema bêhna wî di hate ber, dîsa dest bi peyvînê dikir.

Me pîrsa wî kir. Bişirî û li me veşand: "Ez aniha pir baş im. Ger we rewşa min a berê bidîta, dê we bidîta ez aniha çiqas baş bûme." Berxwedaneke temendirêj a li girtîgehan, ew bêhtir kiribû mirovekî dijwar, xweşik û serbilind. Ew zilm û zora giran, ku lê hatibû kirin, hiç ne xema wî bû. Her ku dipeyvî, behsa şoreşa welêt û rewşa dewletê dikir.

Piştî bêhnêkê din, berpirsiyarê komeleyê gotê: "Hevalê Musa, îro salvegera avakirina NÇM'ê ye. Rêveberên wê te jî vedixwînin. Ger tu bikaribî, emê herinê, va ye nêzik e." Bersiva wî erênî bû. Me bi hev re berê xwe da NÇM'ê. Şahiya salvegera NÇM'ê li qatê sîsiyan bû. Ji ber wê yekê me hinekan bi destê wî girt û em hêdî hêdî hilkişiyên qatê sîsiyan.

Şahiye dest pê kiribû. Di serî de koma dîlanê derket. Bi destmalên kesk û sor û zer dest bi dîlanê kirin. Beşdar giş dilxweş bûbûn. Lê min bi taybetî li madê hevalê Musa dinihêrî. Xuya bû ku pir bêriya dîlana keç û xortên ku di rêça Egît de bûn, kiribû. Rojên beriya ku têkeve girtîgehê û rojên aniha didan berhev. Gelek tişt guheribû. Li navenda metropolê İzmirê, keçên kurd, dîlana Egîtan, dîlana Mazlûman û dîlana ku wî û hevalên wî dabû destpêkirin, digerlandin.

Bêhneke din pêşkêşkar, bi kurtî rewşa girtiyên anî ser zimên û peyva xwe anî ser jiyana bi rûmet ya Musa Torun. Heta wê demê gelek beşdaran hay ji hatina Musa Torun nîn bû. Piştî pêşkêşkar navê wî hilda, çepik bariyan û jinên kurd dest bi lîlandinê kir. Bi vexwendina pêşkêşkar re "jiyana bi rûmet" li ser dikê û mikrofona di dest de bû: "Ez çûme TAYDER'ê û bo serdana NÇM'ê jî hatim vê derê. Ev sazî gelekî baş in."

Carinan destê xwe datanî ser kezeba jêkirî û wekî digot ev ne tiştêk e. Li aliyekî behsa serpêhatiya xwe dikir, li aliyekî jî pêkûtiyên dijwartir ên li ser gelê kurd û girtiyên azadiyê vedigotin. Behsa girtiyên ku bi awayekî hovane li Girtîgeha Amedê hatibûn kuştin, kir. Dawiyê jî destê xwe ber bi zarokêkî kir û got: "Bila jiyana min qurbana vî zarokî be." Şehîdên Zîndana Amedê bi bîr anîn û tevî çepikan daket.

Musa Torun dema çû odeya seroka NÇM'ê, em jî ligel wî çûn odeyê. Hinekî em li ser rewşa wî û dîtînen wî yên li ser sores û welat peyvîn. Dema wî fêm kir ku ez ji welêt hatime yekser gote min: "Ê te çima çengek axa welêt, axa Mêrdînê bi xwe re neanî, da ku min bixwara, heye ku ez pê sax bûma!" Peyre destê xwe wekî ku axê, axa welat bixwe, ber bi destê xwe ve bir. Dawiyê got: "Min bi kurdî gelek nivîs nivîsin lê li girtîgehê man. Divê heval wan nivîsên min bo kovar û rojnameyên bi kurdî bişnin."

ÇETIN MÎZAN

□ 9 adar 1989:

**Mihemed Şêxo çû ser dilovaniya xwe**

Mihemed Şêxo di sala 1948'an de li başûrê Kurdistanê, li bajarê Qamişloke, li gundê Xecokê ji dayik bûye. Mihemed Şêxo heya sinifa 9'an li Qamişloke dixwîne. Di navbera salên 1969-1972'yan de ji bo xebata huner li Lubnanê dimîne. Di 1973'yan de derbasî başûrê Kurdistanê dibe. Di sala 1975'an de li Mehabadê kasetekê dadigire. Heta 1988'an kasetên wî li pir aliyên derdikêvin. Di 1983'yan de vedigere Qamişloke. Hunermendê kurd Mihemed Şêxo di 9'ê adara 1989'an de diçe ser dilovaniya xwe.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 11 adar 1970:

**Li Başûrê Kurdistanê îlana otonomiyê**

Li başûrê Kurdistanê otonomî hate îlankirin. Partiya Baas ji bo ku îdareya Iraqê bi awayekî dorfireh bigire destê xwe, bi Partiya Demokrat a Kurdistanê û hin hêzên çepgir re îlfaqek çêkir û peymanek îmze kir. Li gorî vê peymanê Li başûrê Kurdistanê (bakurê Iraqê) wê hikûmetek herêmî bihata avakirin û cigirê Serokê Iraqê wê kurd bûya. Lê piştî demekê Baasê dev ji vê peymanê berda, Partiya Demokrat a Kurdistanê dîsa dest bi şerê pêşmergetiyê kir.

**ÇAVDÊRÎ****Rastiya gelê kurd**

SERKAN BRÛSK

Leyistika mezîna ku ji aliya hêzên mezîna ên cihanê ve hate plankirin gihîştê encamê. Wan Roja gelê kurd di nava hev de teslîmî tirkan kir. Ji roja ku wê komploya qirêj a navneteweyî dest pê kir û heta ku gihîştê serî Serokê Birêz her bala me dikîşand ser bihêzbûna van hêzên ku li piştê wê leyistikê ne. Dema mirov navê van hêzên ku ev rûreşîya mezîna pêk anîne li cem hevdu dibîne, mirov şaş dimîne. Piraniya van hêzên sed û heştê pileyan li dijî hevdu ne. Rûs û Amerika, yewnan û tirk, Rûs û Ewropa, Îsraîl û hinek dewletên erêban, bi rastî seyr e, qaşo berjewendiyên van dewletan li dijî hevdu bûn!

Ma kurd çi ne? Gelekî ji hevduketî, bêpişt, çarparçe û bîyekitî. Hemû dewletên cihanê ji bo berjewendiyên xwe yê pisîk ji dikarin me kurdan bifiroşin hevdu.

Exlaq. Di realîteya wê cihanê de tu buhayê ehlaq tune ye. Ger hebûya em îro ne di wî halî de bûn. Ger hebûya dê Komara Mehabadê îro hebûya. Ger hebûya dewleta tirk behsa tîkîbirina bîst û heşt serhildanan nedikir. Ger hebûya Qirkirina Helepece û Serdeşt wisa bi erzanî nedihat tefandin. Ger hebûya dê ...

Varîlên petrol û ava me bi qasî ku wijdanê cihanê kor dike, bi wê pileyê jî, rîya qirkirina me vedike. Li hemû deverên cihanê dewlemendiya xwerista neteweyan ji wan re xweşiyê tîne, ya me ji me re talan û qirkirinê tîne. Dewletên dagirker bi pêşkêşkirina dewlemendiya xwerista me devê dewletên serdest digirin û bi wî awayî jî, meqsedên xwe yê hovane pêk tînin. Mirov encax dikare rola aktif a Amerika, Yewnan û Cihûyan wiha fêhm bike.

Dewleta Cihûyan hemû hêza xwe ji bo sergîhayî ya komploya bikar anî û bi wê jî nesekîni bi awayekî hovane çar mirovên me yê destvala şehîd kir û nêzîkî bîst welatparêzên me jî, bi awayekî barbarane birîndar kirine. Ev di wê sedsalê de qetlîam e. Lê di serî de dewleta Alman, ji tu kesî deng dernakeve. Berevajî, tê gotin ku dewleta Alman û Îsraîl di nava hevkarîyê guncaw de ne. Îsraîlî bi wê yekê jî nasekinin, ew nahêlin ku dewletên ewropîyan zextê ji deynin ser Tirkiyeyê.

Sebeb. Pêwîstiya wan di pêşerojê de bi avê heye û dixwazin hêzeke wekî dewleta tirkan gewdegirs, ji bo parastina xwe bi kar binin.

Av, ya ku dewleta tirk li hemberî dewletên erêb wekî tehdîteke mezîna bi kar tîne ji nava dilê welatê me dizê. Her wiha heman av e ku bala Îsraîlê jî, dikîşîne. Dewleta tirk wê dewlemendiya me dualî li dijî tîkoşîna me ya ji bo azadiyê bikar tîne.

Duyemîn faktor jî hêza mezîna a artêşê ye. Tê zanîn ku dewleta tirk di cihanê de xwedî artêşa herî xilbe ye. Wê yekê jî pir baş li hemberî cîranên xwe bi kar tîne. Bêguman hêzeke bi wî rengî jî bo dewleteke wekî Îsraîlê ku hebûna wê li dijî ya tebieta Rojhilata Navîn e, gelekî girîng e. Hejmareke mezîna a wê artêşê jî ciwanên me pêk tîne. Hûn ji xwe re li tewşîya rewşa me baş bîyêşînin!

Rast e, rewşa me bi hemû aliyan xwe li dijî me ye. Lê rastiyeke me ya din heye ku rasterast bi mezinahiya Serok ve girêdayî ye. Serok gelê me ji wê rewşa xerab deranî û ew xiste rojeva cihanê. Wezîra Amerika ya Karên derve dibêje min nizanibû ku kurd evqasî girêdayî Serok in. Bi raya min ew derewan dike. Ev nêzîkî çend salan e ku dewleta wê bi awayekî fiilî di nava wî şerî de ye. Ev dizanin bê serok ji bo gelê kurd çi kiriye. Ew dixwaze bêje "min nizanibû kurd ewqasî neteweyî bûne". Ew di kesayetiya Serok de dixwaze bêje ku min nizanibû kurd bi wê dereceyê bûne xwedî nîrx û şerefa milî. Amerika bixwaze nexwaze dê ji niha û şûn de wê giraniya tevgera rizgarîxwazî his bike. Ew dê wê berhema Serok û Partiyê, ku li gorî şertên herî dijwar hatiye tanzîmkirin bibîne. Ew dê rastiya gelê kurd hinekî ji realîteya kurdan bi xwe fêr bike.

**Serhildana Koçgiriye**

Bêguman ji damezirandina Komara tirk heta îro, nexweşîya herî mezin a dezgeh û birdoza dewletê, zihniyeta qedexekirin û li dijî gelên bindest kotekî û çewsandin, wekî rêbazên sereke xwe dane der. Ev zihniyeta navborî ku ji Dewleta Osmanî wekî mirate hatiye wergirtin îro bûye sedema hebûna dewleta tirk. Li gorî hin dîrokzan û kurdnasan, dema K.T ava bûye, ji imtîhaneke netewî derbas bûye; bi împeryalizm û sazîyên feodal re di destpêkê de, demeke kin be ji tîkoşiyayê. Lê di merhaleyên pêş ên netewebûnê de, aliyan paşverû rû dane û her ku çûye ev yek bûye sedema jenosîda gelê kurd. Heman kiryar û politîka ji bo dewleta tirk bûye siyaseta bîngêhîn. Li hemberî wê siyaseta dîvedirêj û bîngêhîn gelê kurd bi dehan car di nav sinorên Bakurê Kurdistanê de serî hildane, lehengiyên dîrokî afirandine û bi sedhezaran bûne cangoriyên welatê xwe. Serhildana Koçgiri jî, yek ji wan serhildana ye.



Elîşêr û Zarîfe Xanim

bi hêzên tirk re peyman girê dabû. Armanca lijneyê ew bû ku serhildêran bi awayên din mijûl bike, bê tevger bihêle da ku artêşa Nûredîn Paşa bigihêje herêmê û serhildanê tîk bibê. Peymangirêdana Heyder Beg bi hêzên tirk re, bûbû sedema qelsbûn û sistbûna serhildanê. Ev jî bû sedem ku li Qoçhîsar, Zara û Kangalê artêşa Nûredîn Paşa dest bi şereke mezîna kir. "Çeteya Laz Osman" jî di ser Refahiye de êrîş anibû ser Koçgiriye. Piştî karesateke din pêk tî û bi propogandayên Hacî Axayê Kangalê, Serokê Eşîra Ginyanê Murat Paşa jî dibe alîgirê hêzên tirk. Murat Paşa, şervanên kurd Seyîd Ezîz û Zalim (Çawîş) û birayê wî Hûseyîn vedixwîne mala xwe û bi xayintî wan digire û dide destê hêzên kurd. Li hêla din Fermandarên heja yê kurd Sabîr Beg û Behrî Beg û Gûzel Axa şehîd ketibûn. Ev jî bûbû sedem ku kurd bê serok bimînin.

Di wê serhildanê de hin eşîr derbasî nav hêzên tirk bûbûn, hinan ji wan xiyaret kiribûn. Parek mezîna jî ji ber ku şehîd ketibûn, Heyder Beg û Seyîd Ezîz tevî 15 hevalên xwe, wekî dil dîkevin destê hêzên tirk. Heyder Beg û Seyîd Ezîz, li Dadgeha Leşkerî cezayê darvekirinê digirin, lê piştî ev yek pêk nayê û wan sirgûn dikin.

Ji ber ku tevgera Koçgiriye, ne xwedî pergalê sazkar bû û bi rêbazên eşîrî pêk hatibû, ne çû serî û tîk çû.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

**Çavkanî:**

\*Pirtûka Qadri Cemil Paşa: "Doza Kurdistan"

\*Pirtûka Faik Bulut: "Devletin Gözüyle Kürt İsyanları"

Nivîskarê, jiyana ku reh berdaye welatê xeribiyê Mahmut Baksi:

# Ez bengiyê zimanê kurdî me

NECATI BOZKURT

**M**ahmut Baksi jidil dibêje. Ew bêhtir vê dawiyê li ser bala kurdan e. Hemû gotinên li ser dil û zimanê xwe peya dike. Rojnameger Necati Bozkurt li ser jiyana wî, edebiyat, zimanê kurdî, rojnamegerî û nivîskariya kurdî, romana gerîla û romana "Video Gelin" ligel Mahmut Baksi hevpeyvînek saz kir û Mazlum Doğan ji ew bo kurdî wergerand. Em di vê hejmarê de heşa yekem ya hevpeyvîne diweşînin.

\*\*\*


*Dema we dest bi karê nivîskariyê kir, bêhtirîn tesîra kîjan nivîskaran li we bû?*

✓ Bêguman di warê edebiyatê de Dostoyevskî. Ji aliyê zimên ve Dostoyevskî tesîreke mezin li min kiriye. Wekî din min hemû romanên klasîk xwendin. Bo nimûne romana Sholov ya bi navê "Çemê Donê Hêdî Hêdî Diherike" romaneke yekta û bêhempa ye. Demekê jî ez li edebiyata Amerîka Latîn sor bûbûm. Avustuyas nizanîm çi ye! Xelat jî wergirt. Min pirtûkên wî xwendin. Bêguman min Jack London jî xwendiyê...

Ji romanên welatî jî, cilda yekem a Mihemedok (Înce Memed) tesîreke mezin li min kiriye. Wê demê cildek bû. Jixwe min Yaşar Kemal bi vê romanê nas kir. Romanên wî yên din biavêje sergoyê...! Lewre hemû tekrara Mihemedok in. Li aliyê din di warê kurdewarî de medreseya me hebû. Dema ez 7 salî bûm, min hay ji Mem û Zîn, diwana Seydayê Cizîrî, Mewlûda Mele Ehmedê Batê û bi taybetî ji Nûbiharê hebû. Ez bawer im hîma nivîskariya min wê demê hate pê. Her wiha dema dibistana mamostatîyê ez diçûm pirtûkxaneyê, min romanên bo ciwanan dixwendin. Bi vî awayî ez û edebiyat, bûn wekî nal û bizmar. Bi şeweyekî din nivîskariya min tiştekî tesadûfî ye. A rastir ya gelek nivîskaran jî wisa ye...

*Çêbû. We dil tunebû bibin nivîskar. Baş e. We doza çi dikir?*

✓ Tiştekî ecêb e. Dema ez li dibistana mamostatîyê jî bûm, min tu caran doza karûbarê mamostatîyê nekir. Min digot: 'Ez dê biçim li gundê xwe axatî an



✓ Mahmut Baksi ev 20 sal in li "welatê xeribiyê" diji. Ew, ligel çend zimanan bi "zimanê dilê" xwe jî dinivîse. Pirtûkên wî bo gelek zimanên cihanê hatine wergerandin. Lê kurdî "şêrîna ber dilê" wî ye. Wekî ew dibêje: "Her çend min bi hin zimanên din jî pirtûk nivîsibû jî lê min ew wekî pirtûkên xwe nehesibandin. Ji ber vê çendê ez bengî û evîndarê zimanê kurdî me. Ji bo zimanên din jî rêz û hurmeta min bêdawî ye. Min bi tirkî 8 pirtûk nivîsîne."

cotkariyê bikim an jî bi çandiniyê re mijûl bibim. Lewre ez gelekî jî axê hez dikim. Bi gotina çêtirîn, min divê bi axê re bi hev şa bibim û evîna xwe bi wê re parve bikim.

Çemê Xerzan heye, ku pala xwe dide war û axa me û diherike. Min divê herim li wê derê masiyan bigirim û bi şev li ser banan guh bidim ser xuşexuşa Çemê Xerzan. Her tim min doza vê yekê kir û hîna jî dikim. Lê heyf û mixabin ev nebû para min. Ji ber vê hindê ez gelekî dilşewat û xemgîn im. Çemê Xerzanê deyndarê min e. Lewre kesekî ku ez evîna xwe pê re parve bikim, di jiyana min de tune ye.

*Welatê Xeribiyê çi pozîtîf çi negatîf tesîreke çawa li nivîskariya we kiriye?*

✓ Zêdetir tesîreke erênî ango pozîtîf li min kir. Ji ber ku min li vê derê, di warê azad de, şexsiyeta xwe nas kir û ez bûm xwedan şexsiyet. Ez bêtirs û bêyî ku xwe sansûr bikim, dinivîsim. Wekî din ez bi zimanê xwe yê şêrîn, bi kurdî re bi awayekî nivîskî didim û distînim. Dema min li sala 1978'an bi kurdî pirtû-

ka xwe pêşîn "Zarokê Îhsan" nivîsî, ji kêfan lingê min erd negirtin. Te digot qey ez cardin li wan cih û waran vegeyiriyame û ew hembêz kirine. Peyre min di sala 1979'an de "Keça Kurd Zozan" da çapê.

Di wan merc û şertan de min fêhm kir, bê ka zimanê kurdî çendî bikêr, dewlemend, spehî û lihevhati ye. Berî me jî hin kekên me hatibûn li Ewrûpayê kovar û pirtûk derdixistin. Her kesî helbestên Cegerxwîn jî dest hev direvandin. Lê min berê xwe neda helbestrêstîne. Îcar min zimanê tirkî bo zimanê kurdî wergerand. Jixwe dema min bi tirkî dinivîsî jî ez bi kurdî difikirim. Ji ber vê hindê welatê xeribiyê jî bo min bû dibistaneke mezin. Ango bû dibistana kurd û Kurdistanê. Her çend ez 4 hezar Km. dûrî Kurdistanê bûm jî, wekî 4 metre li min dihat.

Piştîre bila Xwedê jê razî be, bi navê Kenan Evren generalek rabû. Ez li ber şkestin û jihevketine bûm. Lewre li Swêde bes komikek kurd hebû. Min li ser wan bi kurdî û swêdî pênc-şes pirtûk nivîsibû. Kokê sermayeya min qelîyabû.

Wekî diyar e sermayeya mirov a kulturî heta cihekî kar diqedîne. Peyre bi yekcarî bi hezaran kesên nas û nenas li Swêde peyda bûn. Ev kes ligel zar û zêç, rabûn û rûniştin, çand û jiyana xwe hatibûn vê derê...

Bi yekcarî Stockholm li ba min bû Diyarbekir. Ew balaxaneyên (gökdelen) li hawîrdora Stockholmê, wekî Surên Diyarbekirê li min xuya dibûn. Min pêjna vê yekê kir. Ji ber vê çendê dema 80'yî ji bo min bû kana destpêkeke mezin. Min berhemên xwe yên herî navdar wê demê nivîsîn. Bi taybetî romana bi kurdî Hêlîn. Min ew di sala 1983'yan de nivîsî. Hêlîn di şerî de fransî jî bo gelek zimanên cihanê hate wergerandin. Ez dikarim bêjim ev roman jî bo nivîskariya min bû mîlad. Lewre ev pirtûk bi kurdî bû. Her çend min bi hin zimanên din jî pirtûk nivîsibû jî lê min ew wekî pirtûkên xwe nehesibandin. Ez bi pirtûkên xwe yên bi kurdî gelekî serbilind dibûm. Ji ber ku ez gelekî hez ji kurdî dikim. Çima? Gotineke min ya bi nav û deng heye. Swêdî li ser munaqêşe dikin. Ji min pirsibûn: "Tu hez ji jinên bi çi rengî di-



✓ Ji kerema xwe re rêz û hurmeta ku em ji nivîskarên xelkê re nîşan didin, em nîşanî nivîskarên xwe jî bidin. Camêr hên jî radihêjin pirtûkên Demirtas Ceyhun, Yaşar Kemal, Murathan Mungan nizanîm kê dixwînin! Ji van re destê xwe didin ser hev lê ji bo Mahmut Baksi dibêjin: "Dev jê berde lo! Ew jî me ye!"

✓ Rojnamegerên me berî her tiştî bila kurdiya xwe bi pêş bixin. Binihêre! Em dibêjin 'rojnamegerî û nivîskariya kurdî'. Bêguman divê em bi erebî, farisî û tirkî binivîsin. Her ziman lazîm û bi kêr e. Lê dema me xwe wekî rojnamegerekî/e kurd hesiband, em mecbûr in hînî kurdî bibin û pê biaxivin.

**M**ahmut Baksi, di sala 1944'an de li gundê Sûphiyê ku bi ser Hezoyê (Kozluk) ve hatiye darê dinyayê. Diya Baksi ji mala axayan, bavê wî jî ji mala şêxan e. Lewre Baksi dibêje: "Ez berhema axatî û şêxîtiyê me." Bi pey gotinên wî, mala dê û bavê wî "heta heft bavê xwe" kurd in. Baksi bi vê yekê xwe serbilind dihesibîne.

Mahmut Baksi, serpêhatiya xwe ya nivîskariyê bi vî awayî vedibêje: "Li medreseya me, tenê bi ziman kurdî perwerdehî li dar diket. Min hem ji medreyê hem jî ji axatiyê gelekî sûd û fêde wergirt. Me dengbêj hebû. Wan ji me re çîroka Mem û Zîn, Evdalê Zeynikê digot. Xwedê ji wan razî be!"

Malbata Baksi, di sala 1950'an de koçî Bilîsê dike. Ew, dibistana seretayî li Bilîsê bi serî dike. Piştî vê bi salekê, dikeve îmtîhana Dibistana Seretayî ya Mamostayî ya Dicle-Diyarbakir û bi ser dikeve. Mahmut Baksi, serpêhatiyên xwe yê wê demê wiha tîne ser zimên: "Min ligel 800 zarokên kurd, gelekî xweş dît, ku kurd çawa têne assîmîlekirin. 6 salan, bi çavê serê xwe min dît, ku çawa bi heq-

ratî li me dixin. Dîsa min bi çavê serê xwe dît, ku çawa bi kurd û alewiyan henek û tinazên xwe dikin." Lê peyre Baksi "şukir ji xwedê" dest ji dibistanê dikişîne. Ew sedemên vê yekê wiha rave dike: "Ji ber ku dawiyê minê jî biçûya li gundekî kurdan, zarokên kurd assîmîle bikira. Şukir ji xwedê re ev nebû nesibê min. Lê ez nabêjim: 'Bila kes mamostatiyê neke û neçe gundên kurdan û hwd.' Minê di van mercan de mamostatî bikira. Ji ber ku piştî rabûna PKK'ê, her çend bi qanûnan hatiye qedexekirin jî, mirov dikaribû heta xwedê bixwaze perwerdehî bi kurdî jî bigeranda. Sed mixabin di dema min de tiştêkî bi vî rengî peyda nebûbû û ez bi vê yekê netamijim."

Baksi, bi şeweyekî profosyonel cara yekem, di sala 1966'an de di rojnameya Batman Gazetesi de dest bi karê nivîskariyê dike. Piştî vê bi du salan ango di sala 1968'an de dibe serokê şaxa TIP'ê (Partiya Karkeran ya Tirkîyeyê) yê Batmanê. Piştî ku ew dibe serokê şaxa TIP'ê, ji ser karê xwe yê TPAO'yê (Hevbeşiya Anonîm ya Petrolên Tirkîyeyê) tê avêtin. Tiştên li pey vê qewimîne Baksi wiha vedibêje: "Li aliyekî bavê min li aliyekî

diya min dor li min teng kirin. Lewma ez nehewiyam, min lîxist çûm Stenbolê."

Mahmut Baksi di sala 1968'an de diçe Stenbolê û di sala 1969'an de romana wî ya yekemîn "Mezrabotan" tê weşandin. Ew romana ku êş û azarên kurdan tîne ser zimên, ji aliyê DDKO'yê ve li %70 Kurdistanê tê belavkirin. Wekî ji her kesî re diyar e roman tê qedexekirin. Baksi dirêjahiya van rojan wiha diyar dike: "Ji ber şkenandina xalên 141142'yan doza min li mahkeme kirin. Peyre min li ser jiyana zanayê tirk "Şadi Alkılıç Baba" pirtûkek nivîsî. Li ser hev pênc caran ev pirtûk qedexekirin. Ha yek jî wê demê di kovara Türk Solu de bi navê "Meseleya Kurd" hevpeyvineke Mihri Belli derket. Piştî vê yekê jî li wê xana bi nav û deng Sarsalya Xan, îşkenceyên xedar li min kirin."

Li pey van serpêhatiyên, Baksi bo wergirtina pasaportê serî li dewletê dide lê dewlet pasaportê nadê. Peyre bi wan rêbazên diyar, di roja 26'ê gelawêjê sala 1970'î jî Tirkîyeyê xatir dixwaze. Piştê nema li Tirkîyeyê vedigere... Ta derketina bo Ewropayê serpêhatiya Mahmut Baksi bi vî awayî berbiçav dibe.

kî?" Min gotê: "Jinên por reş. Ji ber ku evîndara min ya yekem por reş bû." Gotin min: "Kî ye?" Min gotê: "Diya min e." Ma jî vê tiştêkî tabî heye? Dema ez hatim darê dinyayê li dêvla 'Ana, Anne' min gotiye 'Dadê'.

Ji ber vê çendê ez bengî û evîndarê zimanê kurdî me. Bo zimanên din jî rêz û hurmeta min bêdawî ye. Min bi tirkî 8 pirtûk nivîsîne. Hêviya min jî ew e ku rojekê nivîskarekî/e tirk rabe, dev jî 8 heban berde, bila bi kurdî pirtûkekê binivîse. Zimanê kurdî wekî ew dibêjin ne aloz û dijwar e.

*Heya niha çend pirtûkên we hatin weşandin?*

✓ Ji 20'î zêdetir in. Ku em zimanên bijmêrin: Kurdî, tirkî, swêdî, danîmarkî, norwecî, hollandî, almanî, erebî, fransî, îngilîzî. Ji bo min ev cihê serbilindiyê ye. Berhemên min Hêlîn û Lawikê Xerzan direkt ji kurdî bo zimanên ewrûpî hatin wergerandin. Ev jî bo edebiyata kurdî daneke (katkî) mezin e. Qet nebe edebiyata kurdî xiste nava rêza edebiyatê cihanê. Li ser navê kurdan ez gelekî bextewar û serbilind im.

Min divê bala TC bikşînim. Lewre digot: "Zimanê kurdî nîn e, nîn e, nîn e!" Berhemên min ji bo zimanê herî navdar ên cihanê hatine wergerandin. Bi vî awayî vir û çirandinên TC ên li ser zimanê kurdî li berga Gundikê Dono, Hêlîn, Lawikê Xerzan qelibîn û bela we-

la bûn. Êdî دنیا behsa edebiyata kurdan dike. Ez pê gelekî kêfxweş dibim.

*Di warê de hûn bi helwesta nivîskar û rojnamegerên kurd dixweş in?*

✓ Ez pê dixweş im. Lê ji kerema xwe re ez careke din dibêjim, bila ew berî her tiştî kurdiya xwe bi pêş bixin. Binihêre! Em dibêjin 'rojnamegerî û nivîskariya kurdî'. Bêguman divê em bi erebî, farisî û tirkî binivîsin. Her ziman lazîm û bi kêr e. Ji vê re tiştêkî nabêjim. Lê dema me xwe wekî rojnamegerekî/e kurd hesiband, em mecbûr in hînî kurdî bibin û pê biaxivin.

Li aliyê din bo rojnamegerên kurd rêz û hurmeta me bêdawî ye. Lewre di nava 10 salan me ji 20'î zêdetir şehîd daye. Ma rojnamegerên kîjan miletî evqas bedel dane? Ji ber vê hindê divê devê yê ku dibêjin 'rojnamegerê/a kurd ne baş e, xirab e' xwar bibe. Divê em xwedî li şehîdên xwe derkevin.

Bêguman ev tîrî me nake. Her wiha xebateke înternasyonalîr, bêtereftir û bêtosansûrtir divê. An jî birakê min! Hinekî hînî îngilîzî bibin! Wekî din hûnê nuçe û agahiyan direkt ji rojnameyên tirk werdigirin, ku ji sedî nod û nehê wan vir û derew e. Ji kerema xwe re ji me hin jî bila hînî almanî û fransî bibin. Divê em direkt ji kana wan nuçe û agahiyan wergerin, da ku rojnamegeriyeke tîkûz a kurdî peyda bibe. Ji bo ku em girseyên gel zana û hişyar bikin, divê

me xwendevanên xwe ji zilm û zor û derewên Babalî bifiltînin.

Li ser nivîskarên me jî; Ka em bêjin şertên Tirkîyeyê zor û dijwar in û li mirov dibin agir. Qebûl. Lê Xwedê zêdehiya wan bide, bi sedan nivîskarên me li ser navê Kurdistanê têne li Ewropayê dijîn, hem jî wekî qralan dijîn. Dîsa jî tevî îmkanên zêde yê ji bo hînbûna zimanê kurdî, nivîskarên ku bi kurdî dinivîsin, tevî hev çend kes in! Ma ne şerm û eyb e? Her wiha ne bobelot e?

Hin hevalên me ji dêvla ku tezên xwe li ser Kurdistanê çêbikin, radibin li ser tiştên beredayî û bêtêr çêdikin. Nizanîm 'Dema kevîr li serê mirîşkê dikeve, çiqas zerar li mêjiyê wê dibe'. Tiştên beredayî û eletewş. Li dêvla ku li ser van tiştan bisekinin. Li Ewropayê şeniya kurdan heye. Ma xwediyê wan kesan tune ye? Yê ku tîr, hîna behsa wan serpêhatî û teoriyên xwe yê peritî dikin an jî pirtûkên ku qet eleqeya wan bi kurdan re tune ye dinivîsin û dixwînin. 20 salan tu pirtûkên welatê ku lê dimînin nexwendîne. Lazîm e pêşîn li tirkî bîne wergerandin, wê peyre camêrên me bixwînin! Şerm e. Diviyabû heya îro kurdan bi hezaran pirtûk biweşandana. Heta niha me bi tiştêkî girtibû û digot: "Bila ên din her dem li ser kurdan binivîsin" Em ketibûn taya vê yekê. Piştê me digot: "Çima xelk ji me re nanivîse?"

Rojekê min ji Yılmaz Güney pirsî: "Kekê! Tu çima bi kurdî filmekî çênakî?"

Wî jî got: "Bi Xwedê û namûs, ku tu nebûya minê şerê te bikira!" Min gotê: "Çima?" Yılmaz wiha li min vegeand: "Ka em ji te dest pê bikin. Çend sal in tu li Ewropayê yî? 20 sal. Bavê min! Ê ku bi kurdî zane û li ewrûpayê yî tu yî û ê ku bikaribe bêsansûr filman çêke, tu yî. Tu çima ji xwe napirsî? Ma tu çima çênakî û ji hin kesên din hêvî dikî? Divê em xwe ji vê kompleksa xwebiçûkdîtinê bifiltînin."

Ha tiştêkî din. Ji kerema xwe re rêz û hurmeta ku em ji nivîskarên xelkê re nîşan didin, em nîşanî nivîskarên xwe jî bidin. Ji ber ku navê wan Mahmut û Mehmet e? Camêr hîn jî radihêjin pirtûkên Demirtas Ceyhun, Yaşar Kemal, Murathan Mungan nizanîm kê dixwînin! Ji van re destê xwe didin ser hev lê ji bo Mahmut Baksi dibêjin: "Dev jê berde lo! Ew jî me ye!" Ew kes bi psîkolojiya mirovên koloniyên (mêtingeh) dijîn. Şerm e. Hebe tunnebe divê em xwe ji vê psîkolojiya şkestî bişon. Hevalên li nîrx û qîmetên me xwedî dernakevin, baweriya xwe bi gelê kurd neyinin. Ê ku em afirandine, gelê kurd e. Nexwe divê em li nîrxên gelê kurd xwedî derkevin. Piştê nivîskarên xwe bigirin. Lê ên me vê yekê nakin. Dema ku konferansekê pêşkêş kirin, em me diçin kekekî xwe dawet dikin. Kekekî tirk! Ma tu çima yekî/e kurd dawet nakî? "Na lo! Jixwe ew ji me ye!"

(Dê bidome)

# Di şoresê de wêje û rewşenbîr (2)

ABDULLAH ÖCALAN

Me dil heye bi navê "di pêvajoya şoresê de Kurdistan û wêje" nixandinekê bikin. Ez bawer im dema Tolstoy "Şer û Aşti" nivîsand xwedan rêbaz û metod bû. Bûyera romanê, piştî salên 1800'î li Rûsyayê diqewime. Min ew roman nexwend lê yên ku xwendine ji bo ku li welatê xwe binin, ez wekî rêbazekê bi bir dixim. Tolstoy, ji dilûcan pêjna cihên ku lê şer qewimiye, dike. Yek bi yek li cihên ku şer lê qewimiye digere. Diçe pirtûkxaneyan, çavkaniyên li ser vê mijarê dixwîne û lê dikole. Bi gelek kesên ku ew bûyer bi çavên serê xwe ditiye re dipeyive. Dawiyê, romana bi navê "Şer û Aşti" tê pê. Şerê ku di çend rojan de rû daye, dike berhemeke klasîk. Halbû ku di dîroka Rûsyayê de şer gelek in.

Niha şerê ku li Kurdistanê diqewime, di vê berfirehiyê de şerekî pêşin û dawîn e. Şerê û man û nemanê ye. Şerê ku çare-nûsa her tiştî diyar dike ye. Em li hemû plan û programên Cûntaya 12'ê Rezberê binêrin û peyre ji li kiryarên Şerê Taybetî; Ji "Techîra (danekoçberkirin)" ermenyan çendîn car bêhtir a kurdan li dar e. Ermenî hinek tirsandin û piştî sirgûn kirin. Bi baweriya min vê yekê çend mehan berdewam kir. Lê ya me dikeve 15 saliya xwe. Du salan ji haziriyên wê hatin kirin. Dijmin, di salên 1982-1983'yan de têdighêje ku, em dê dest bi tevgerê nû bikin û ew ji li gorî vê yekê plana xwe digerin û jixwe em di 13 saliya şer de ne.

## Gencîneyeke mezin li dar e

Koçberiya kurdan dijwar û dirindetirîn koçberiya dîroka cihanê ye. Bi plansazî û armançeke politîk tê gerandin. Hêvîdar im rewşenbîrên me, dê li vê pêvajoyê bikolin. Ne bi tenê ji aliyê wêjeyî ve, bi şirovekirinên normal ên dîrokî û siyasî dest pê bikin, dê pêrgî dimenên seyr werin.

Li ser "Techîra Kurdan" rawestin. Ji terteleya ermenî û cihûyan xirabtir e û ew tertele li ber a kurdan kêr dimînin. Mixabin rewşenbîrên me ku diviyabû li pirsên gelê xwe bikolana û di rêza pêşin de cih bigirtana, ne bi miyopî, lê mîna korek şel û tevgera wan şirovekirin ne mimkûn e.

Min navê dirêj bikim. Li 15 salên Şerê Taybetî temaşe bikin; ji bo gelê me çi fikirîne û çi kirine! Ji sê hezarî bêhtir gund hatin kavilkirin û valakirin. Hinek dibêjin, bi tenê karê kontgerîlayê ye. Na. Ev "şerekî heralî (topyekûn savaş)" ye.

Hemû partiyên siyasî heta klîkên leşkerî û siyasî jî hevkarîyê dikin, da ku kurdan ji ser welatê wan dûr bixin. Peyre jî tirkên penaber bi cih bikin. Aniha jî ev plan û programên wan bi lez û bez tene domandin.

Li dijî vê yekê berxwedaneke me ya mezin heye. Li zindanan, li serê çiyê, bi serhildanan û li derveyî welêt. Her warê berxwedanê bi serê xwe mijara lêkolîneye. Berî her tiştî pêşniyaza lêkolînen siyasî dikim. An na tu rûmet û girîngiya kurd, Kurdistan û axê namîne. Her wiha ne mimkûn e mirov bibe rewşenbîr û ne ji welatparêzekî/e jirêzê.

Ger rewşenbîr dixwaze li gorî rol û erka xwe bibe xwedan nêzîkbûnekê, berî her tiştî divê tiştên rû didin, bibîne. Tolstoy lêkolîna şer a herî baş dike. Her wiha analîza herî baş a civaka Rûsyayê ya wê

Heke sê hezar gund bi zordarî hatine valakirin, çend hezar jî bi rîza dilê xwe vala bûne. Ew hemû berhemên Şerê Taybetî ne.

## Dil û mêjî dagir bûye

Niha ku rewşenbîrê pêjna van tiştan nake, rewşenbîr li aliyekî, ez nikarim wî wekî mirovekî welatparêz jî, ku bi welatê xwe re eleqedar e, bi nav bikim. Divê em birêz Îsmail Beşikçi, ku temenê wî di zindanan de bihurî, bi bir binin. Li ser rastiya me zêde ne şareza bû. Bi namûsa zanyarekî berê xwe da me û her ku pêwîstiya nivîsinê lê rabû, nivîst. Ceza û zindan qet ne xema wî ye. Hîna jî li ser gotina xwe ye û xwedan cesaret e. Rewşenbîrên kurd dikarin ji serpêhatiya Beşikçi fêrî gelek tiştan bibin.

Mixabin bala rewşenbîrên me ne li ser

ya tirkan ji ya ecem û ereban dijwar û xeternaktir e. Ji ber vê çendê nêzîkî rastiya xwe nabin. Ji bo nêzîkbûnê dil û mêjî divê. Ji bo rewşenbîran tespîtîkirina van xalan mimkûn e. Divê tu vê hovîtiya ku li vî welatî dibe, binirxîni. An na tu nikarî bibî rewşenbîrê vî gel û welatî. Divê tu dîroka xwe bizanibî! Ger di dilê te de qêrînek heye, mîna helbestekê bîne ser zimên. Ger tu bi zanyarî lêkolînan bikî! Heke te dil heye bêhtir lê bikolî, romana xwe binivîse. Lê niha ev li holê nîn in. Herî zêde wêjeyanek ku dijminê xwe taswir dike ye. Ev dijmin di vî welatî de gundan dişewîtine û mirovan dikuje. Nikarin nixandinekê berfireh a vê yekê bikin. Dilê wan ji bo gelê wan hilnaavêje.

## Nivîskarên cihanê li tevgera me dikolin

Ez têkoşîna reşîkên afrikayî biçûk nabînim. Ji ber rewşa wan xemgîn dibin lê ji bo gelê xwe xemgîn nabin. Lê temaşe bikin, hinek "bedewî" yên Ewropayê hişê wan ji serê wan dibe, lê bir nabin ku li welatê wan jî hinek bedewî û spehîfî hene. Bi vî awayî mirov nikare bibe rewşenbîr û estetîst. Ne hewce ye serî kêlikê zimandirêjîyê bikin û bêjin: "Apo dîktator e û êrîşî me dike!" Ez jî wan re rêzdar im û wan vedixwînim ser karê ku hemû rewşenbîr û wêjekarên neteweyên hemdemên din dikin. Çima hêrs dibin? Pirsên min gelekî zelal in û pêwîst nake ku hûn xwe bidin alî û çivan bidin xwe.

Em dixwazin demeke wêjeyan a cidî bidin destpêkirin û derfetên xwe yên madî û manewî bêyî tişteki jê hêvî bikin, têxin xizmeta wan. Êdî li ser PKK'ê rawestin û lê bikolin. Niha hemû nivîskarên cihanê yên navdar tîrêjan didin ser me û li serpêhatiya me dikolin. Li ser navê dewletên mîna Amerîka, Fransa, Îngilistan û Almanyayê gelek nivîskar û rewşenbîr tene cem me. Heta min jê gelek got min dem nîn e û min ew qebûl nekirin. Dibêjin: "Me divê pirtûkekê binivîsin." Rewşeke wisa seyr û balkêş derketiye holê. Rewşenbîr, bi helwesteke bêwate mîna ku PKK'ê tawanbar be, xwe jê didin alî.

Di demên dawîn de ereb jî eleqedarîyê nîşan didin. Pir balkêş dibînin lê yên me hîna pê nehesiyane. Mesele çendîn kêmasî û çewtiyên wan hebin jî cara yekem tirkan li ser me pirtûk nivîsandîye. Rewşenbîrên ku hîn dibêjin: "Tabû ye, nêzîk nabin!" Jixwe gelekî jar in, ev helwest û nêzîkbûna bêhtir wan jar dike.

Tevgera PKK'ê ev pêşketinên mezin ku jê re rê vekiriye û derxistiye holê, ji bo edebiyatê gencîneyek e. Ev yeka hanê ne nepixandine.

(dê bidome)



Abdullah Öcalan, di vê beşa nivîsa xwe de li ser "techîra" kurdan radiweste û bala dikşîne ser sersariya rewşenbîrên kurd. Bo nimûne ew behsa romana Tolstoy a bi navê "Şer û Aşti" dike û di de zanîn ku Tolstoy ji bo ku vê romanê binivîse, li cihên ku şer lê rû daye, yek bi yek geriya ye. Lewre Öcalan rewşenbîrên kurd bo lêkolandina serpêhatiya PKK'ê vedixwîne û di de zanîn ku wan ji bo edebiyateke baş gencîneyeke têtûz afirandîne ye.

demê dike û tîpên wê derdixe holê. "Dê" Gorkî û tîpên Dostoyevskî gelekî balê dikşînin ser xwe. Lê di van salên dawîn de Kurdistan bû "welatê jibîrbûyî" yan. Welatekî ku navê wî tunebû. Welatekî ji kavilbûyî heta ji kavilbûnê kambaxtir.

Welatê ku her kes ji bo revê ketiye rêzê. Ji aliyekî ve tîrsa mirinê, li aliyê din avriya (artîk) jiyana kapîtalîst tê pêşkêşkirin. Pêşîn malbatekê dişîne, ew dibêje: "Li vir jiyana gelekî xweş e!" Piştî riya pasaportê vedike. Şebekeyên pasaportê yên ku bi polîsan re kar dikin, saz dike. Peyre jî dapîr û bapîrên heftê salî jî di nav de hemûyan bi rê dikin, dawiyê jî kes li gund namîne. Hinek gund jî bêyî çewsandin û zordariya dijmin vala bûne.

pêvajoya kavilkirinina welatê me qet û hîn jî serê xwe bi gelek tiştên balkêş, mîna "kêmasî û qusûrên PKK'ê çi ne?" diêşînin. Naxwazin dijminê xwe bibînin. "Gelo terora PKK'ê çendîn xeternak e?" Li aliyê din naxwazin dijminê ku ev hezar sal in welatê wan talan dike, analîz bikin.

Gelo mirov dikare vê rewşê çawa şirove bike? Xuya ye serê wî/wê ji aliyê kolonyalîzmê ve hatiye dagirkirin. Dilê wan jî destê wan hatiye girtin. Kêşeya bingehîn li vir e. Dil û mêjîyê kesên ku wekî rewşenbîr tene binavkirin, bêhtir hatiye dagirkirin. Ruh û mêjî bi awayekî seyr û xweser ji aliyê kolonyalîzma tirk ve hatiye kirin. Bi baweriya min ên din jî koplyekê erzan e vê yekê ne. Dagirkeri-

Navenda Çanda Mezopotamya ya Îzmîrê

- **06.03.99 şemî:** Konferans "Pergala dinyaya nû groverbûyîn (kûreselleşme) - Fikret Başkaya, saet:17.00
- **07.03.99 yekşem:** Kermes (Ji bo Roja Jinên Kedkar ên Dinê), saet:16.00  
Çalait:"Şêr şêr e çî jin e, çî mêr e" Koma Kendal, Şanoya Hêvî, Koma Azem, saet:17.00
- **10.03.99 çarşem:** Konferans: "Di Roja Jinên Kedkar ên Dinê de Jina Kurd" - Eren Keskin, saet:18.00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



● **12.03.99 în:**

Konsera Koma Rojhilat 'Mezrobotanîm ez', saet:18.00  
YÇKM

● **06.03.99 şemî:** Şahiya ciwanên xwendekar-2  
"Şeva muzîk û helbestê", saet:15.00

● **07.03.99 yekşem:**

Filmê Jim Sheridan- Ji bo Bavê min, saet:17.00

● **12.03.99 în:**

Filmê Hektor Oliverio "Şeva Pênûsan", saet:19.00

Kurtefilmê yekemîn ê NÇM'ê 'Ax' bi galayekê hate pêşkêşkirin:

# Ligel her tiştî liberxwedan 'Ax'

Piştî demeke dirêj, bi hewla endamên Teatra Jiyana Nû ya NÇM'ê di warê sînemayê de ji gaveke bi nîrx û xweş hate avêtin. Wekî tê zanîn yek ji warên NÇM'ê ku li ser xebatê dike ji sînema ye. Heta niha ligel ku di warê tiyatroyê de bi taybetî bi çêkirina Komara Dînan 'Şermola' berhemeke baş derxist û ji xwe re cîyê baş girt ji, di warê sînemayê de tu berhem nehatibûn afirandin.

## Ji şerê qirêjî dîmenek

NÇM'ê kurtefilmê bi navê 'Ax' roja 16'ê reşemiyê li salona sînemayê ya Akademi-Stenbol pêşkêş kir. Film, valakirina gundekî li Kurdistanê û berxwedana kalekî, pest û pêkutuyên leşkerên tirk ên li ser gundiyan, radixe ber çavan. Di film de lîstikvanê tekane Hikmet Karagöz e. Karagöz, bêhtir bi rola xwe ya rêzefilmê "Bizimkiler" Abbas tê nasîn. Filmê 'Ax' ku 28 deqîqeyan dom dike, ligel hin kêmasiyên xwe yê teknîkî dişa ji ji aliyê piraniya temaşevanan ve hate ecibandin. Ji ber ku di salonê de cih nema, gelek bîneran li ser piyan li film temaşe kirin. Sînemagerên wekî Atif Yılmaz, Hüseyin Kuzu, Ahmet Soner, Yeşim Ustaog-

lu û Yusuf Çetin jî, ji bo film kêfxweşiya xwe diyar kirin. Ax, wê di rojên pêşiyê de li navendên çandan bê raberkin.

Me bo girîngiya yekemînbûna filmê NÇM'ê, digel derhênerê 'Ax'ê Kemal Öz, kurtehevpeyvînek pêk anî.

**Hûn dikarin hinekî çîroka film vebêjin. We çawa dest bi xebatê kir, çi qasî dom kir û hwd?**

✗ Valakirin û şewitandina gundan, bi taybetî ji ber şer, koçkirina mirovan jixwe timî pîrsgirêkeke di rojeva polîtîk de ye. Ligel ku di sohbetên siyasî de tene ser zimên jî, li paşperdeya vê her wiha di dinyaya van însanên ku vê yekê dijîn de, bi awayekî berbiçav ev rastî cihêtir in. Gava em çûn Kurdistanê vê yekê bi awayekî berbiçav xwe dida der. Tenêtiya kalên li wir ji aliyê hestî û hunerî ve ji mirov di bin bandora xwe de dihêle. Li ser vê yekê me jî got em dikarin çawa bi awayekî estetik, êş û janên van mirovan vebêjin. Bi nêzîktêdayîneke bi vî rengî me dest bi nivîsandina senaryoyê kir. Li ser vê yekê me xebateke 3-4 mehî kir û dawiyê me filmekî dramatik çêkir. Me di rêbendana 98'an de dest bi kişandinê kir.

**We navê film 'Ax' daniye. Ji bo çî?**

✗ Bi taybetî gava mirov li Kurdistanê wê valahiyê hest dike, mirov dûrbûyîne jî hest dike. Dûrbûn jî, dûrbûna mirovên ji welatê xwe hatine koçberkin. Daxwaz û hestên van mirovan giş, tiştên psikolojîk têkilî tégînekê ne, ew tişt jî ax e. Tiştê ku ew mirovê kal terk nake, tenê axa wî ye. Yanî paşeroja wî, jiyana wî, serboriyên wî, hemû ax e.

**Ev xebata film a yekemîn a NÇM'ê ye. Hûn vê yekê çawa dinixînin? Her wiha niha ji bêyî vê, tu xebatên we yê berbiçav hene?**

✗ Ji ber ku ev xebata me ya ye-



**Kazım Öz:**

Bi vekirina NÇM'ê (1991) re dest bi xebatê kir.

kemîn e, me pir zehmetî jî kişand. Bi taybetî di vî warî de bo saziyên me yê birêxistin jî ev xebat yekemîn xebat bû. Ji aliyê me ve bo naskirina sînemayê, bi taybetî piştî destpêkirina têkoşînê, pêkanîna xebateke hunerî di vî warî de û xebatên piştî vê pir girîng e. Tu cudahiya pêvajoya çêkirina vî kurtefilmî ji ya filmeke dirêj çênebû. Her çiqas me nekarî hemû fikrên xwe bikin nava film jî, ji bo ku ev filmê yekemîn e, ji aliyê me ve girîng e. Em dikarin bêjin em bi ser ketin.

Ji bêyî vê niha xebateke me dişa li ser şer heye. Li ser kirinên nemirovane yê li Kurdistanê ye. Ku wekî senaryo em bika-ribin biqedînin, di rojên pêşiya me de emê wê pêk bînin. Wê ew jî kurtefilm be. Bo filmên dirêj, ligel ku ne berbiçav in jî projeyên me hene.

**Bêguman ev film şerê qirêjî ê li Kurdistanê tê meşandin tîne zimên û cara yekemîn e di sînemayê de derdikeve pêşberî mirovan. Wekî cara yekemîn, 'Ax' çi qasî bersivê dide pêdiviyên di vî warî de?**

✗ Rast e sînemaya şerê kurdan bûyereke gelekî mezin e. Piralî ye. Pîrsgirêk ne ew e ku hemû tiştên tene jiyandin bînin ser perdeyekê. Di vî şerî de çî bibe bila bibe, hin kes hene ku xaka xwe terk nakin. Ev kesên îxtiyar, di heman demê de ji berê ve jî gelek tişt jiyane. Me tenê xwest tiştên di dinyaya wan de, bînin ser zimên. Tiştên gelekî mezin û diwartir hene, bêguman çîroka wan, yanî ya gerîla û hwd. hene. Ev tiştên gelekî bi îdia ne. Em naxwazin her tiştî bi carekê re têxine film. Jixwe huner jî ne wisa ye. A girîng ew e ku em tiştê bînin ser zimên. Her çiqas li ser mijarekê tenê be jî pir girîng e.

**We film ne li Kurdistanê kişand. Ji ber ku we ne li cîyê bûyerê çêkir, vê yekê di pêkanîna rolan de hestek çawa bi we re çêkir?**

✗ Tabî kişandina film li cihê bûyerê, an li ser xaka xwe, bêguman wê bêhtir bi qelîte be û bêhtir wê bandora wê psikolojiyê li ser lîstikvan hebe. Sînema bi tenê beşeke ku şert û mercan diyar dike ye. Yanî li Kurdistanê ji nebe, heta li Tirkiyeyê jî nebe, dikare bê kişandin. A girîng ew e ku xebat baş bê dîmenkirin. Divê mirov ji hemû aliyan ve; kostum, dekor û hwd. bixe wekî mekaneke Kurdistanê. Gava ku di beşan de xebat rast hate kirin, ligel erdnîgariyê, mijar dikare bê ser zimên. Yanî me ew heyecan hîs kir.

**Di filmçêkirinê de aliyê aborî jî pir girîng e. We di vî warî de çi qasî zor kişand?**

✗ Me film havînê kişand, ku me ji aliyê aborî ve problem nekişanda, me karibû di dawiya tebxê de ji galaya wê çêbikira. Dostên me jî alikarî dane me. Hinek hatina ji filmê 'Rêwitiya Ber bi Rojê ve', em di wir de jî xebitîbûn, me ji bo vê xebatê xerc kir. Wekî pere nêzi 2.5-3 milya- rî li vî filmî çû.

**Di pêvajoya kişandina film de çî astengî derketin pêşberî we?**

✗ Herî pêşîn em pir lê xebitîn ku dûrî çavan bikişînin. Heya ji me hat, me kir ku derdor pê nehese. Li Stenbolê pîrsgirêka montajê derket hemberî me. Piştî ku dawiya film dîtî, dev jê berdan û em der kirin. Em derbasî stûdyoyeke din bûn, dişa qebûl nekirin. Ji ber wê jî dem pir ajot. Lê bi taybetî di vê pêvajoyê de danîşana film, ji aliyê me ve serkeftineke baş e.

EVÎN RONÎ

ax

senaryo:

NÇM SÎNEMA

derhêner:


Kazım ÖZ

derhênerê dîmenê:

Ahmet DEMİR

lîstikvan:

Hikmet KARAGÖZ



Werin em strabêja şeş salî bi hev re nas bikin

# Ji başûrê biçûk Awaz Dêrikî

**A**waz Dêrikî di temenê nêrgizan de ye, ew li Şamê rûdine, dengê

Di Newrozên Şamê de stranên şoresgerî dibêje.. Me ev hevpeyvîn li

Awaz tu çend salî yî?

– Pênc û nêv.

Tu çima stranên dibêjî?

– Ji bo ku di MED-TV de derkevin.

Tu ji kîjan stranbêjî bêhtir hez dikî?

– Strana ez biçûk im, ji ber ku ew li ser zarokên

Kurdistanê ye,

Te çawa dest bi stranê kir?

– Bavê min got.. û gişan nas kir dengê min xweş e..

ez jî ji dengê xwe hez dikim.

Tu li ser şehîdan jî distirê.. ma şehîd kî ne?

– Dijmin wan dikujin... dijmin pîs in.. gerîla dikujin

û şehîd ji bo welatê xwe şehîd dibin.

Niha tu çi dikî?

– Em prova çêdikin ji bo kasetê.. li ser şehîd û zarokan e.

Tu ji zarokên kurdan re çi dibêjî?

– Ez dibêjim, ez ji bo we destirê.. ez dixwazim ew jî bi min re

bistirên.

Tu ji kîjan amûrên muzîkê hez dikî?

– Qanûn.

Ka ji me re straneke xwe bibêje

Em biçûkên Kurdistan

Va em diçin dibistan

Qelemê me wek şûr in

Şîretkarên me pîr in

Dijmin çavê xwe veke

Sibê li me meyze ke

Lê em ne wek te kov in

Xweş nas û xweş mirov in.

JAN DOST /BAŞÛRÊ BIÇÛK



## HEJMAROK

*Yekê yekê*

*Du xanekê*

*Aroo vingo*

*Pir qulingo*

*Şabî şahî*

*Tîr enabî*

*Hestiyê kewê*

*Li bin mêwê*

*Mêw firiya*

*Çav sipiya*

*Bis-li-vi-ya*

\*\*\*

*Hehecikê*

*Qelancikê*

*Mastê miran*

*Ber wezîran*

*Te dî, min dî*

*Ser kanika*

*Sor û spî*

*Heskê bîne*

*Girarê tevde*

*Garan çûye*

*Golikan berde*

\*\*\*

*Bûka narê*

*Çû ser darê*

*Pîf kir kalê*

*Kal melisî*

*Pîr fetisî*

*Bûk reqisî*

BERHEVKAR:  
ROŞAN LEZGÎN

\* Ew li bin te nefere  
tu diçî ew bi te re  
(ling)

\* Şivane ne şivan e  
Dijminê hovan e  
Li çiyên û gundan e  
(kûçik)

\* Hem tal e hem şîrîn e  
Tu meriv bê wî nîn e  
Bê hestî ye, goşt û xwîn e  
(ziman)

\* Rûyên te deşt û zozan  
du çavkanî tê de ne  
Orte Çiyayê Sîpanê  
Du qulik di bin de ne  
(poz)

\* Lawirekî hovî ye  
Dijminê berx û mî ye  
Bêje navê wî çi ye?  
(gur)

\* Bê dest û ling e, dimeşe  
Dîtina wî ne xweş e  
Dev sehrekî rûş e  
(mar)

\* Tu diçî ew dimîne  
Li bin te ye nabîne  
Ê rê nebîne dîn e  
(rê)

\* Reş sipî ye pel bi pel  
Raman û eql e ji bo gel  
(pirtûk)


RAMAN ÇAKAR

T  
I  
Ş  
T  
O  
N  
E  
K

# Avaşîn şoreş û hunerê digihîne hev

Hejmara dehan a weşana Înstîtuya Kurdî ya Stocholmê Avaşîn derket. Di vê hejmarê de jî girani li ser nivîsên ku ji zimanên cur bi cur hatine wergerandin e. Di nava rûpelên kovarê de nivîsên bi du zaravayên kurdî (kurmançî û soranî) hatine weşandin. Dema mirov bala xwe dide naveroka nivîsan jî mirov rastî mijarên têvel tê. Tevî ku kovar zêdetir wekî kovareke çand û hunerî tê zanîn jî, nivîsên lêkolînî di nava rûpelên kovarê de cih girtiye.

Piştî nivîsa pêşgotinî ya ku der barê naveroka vê hejmarê û xebatên Înstîtuya Kurdî ya Stocholmê de hinek agahiyên dide, nivîsa bi navê "Bimeş hevala Hêlîn tê!" Ev nivîsa wêjeyî ji hêla Newzat Gungor ve hatiye nivîsandin û serboriya gerîlayekê vedibêje. Îsmet Kayhan di nivîsa xwe ya bi navê "Xak û pakhatin" de bo şoreşger û welatparêzan girîngiya xaka welêt li ber çavan radixe. Di vê nivîsa analîzî de tê gotin ku mirovê ku girîngiya xakê fêhm neke, nikare demeke dirêj wekî welatparêz bimîne. Ev nivîs jî tirkî hatiye wergerandin, wekî wergêrê nivîsê Avaşîn hatiye derpêşkirin. Nivîseke din a ku li ser jiyana gerîlaleyekî radiweste jî bi destê Zeynep Ronahî ve hatiye nivîsandin û sernavê vê nivîsê jî "Niha hemû gir girên hêvî ne" ye. Nivîs jî bo bîranîna gerîlayê bi Şervan (Metin Baba) ku di meha gulana 1998'an de li Dêrsimê şe-



hîd ketiye hatiye nivîsandin.

Di nivîsa bi navê "Xeta xwar ji Gayê pîr e" Mahabad Amedî li ser malbata Barzaniyan dîtî û ramanên xwe pêşkêş dike. Digel vê mijara sereke, li ser Fêrîqînê û welatparêzên wekî Mele Evdîlayê Tîmoqî, Seydayê Mele Umadîn û Muhterem Biçimli jî tê rawestandî. Di nivîsê de rexne li Mele Mistefa Barzanî

tê girtin û helwesta wî ya neyinî li hemberî tevgera Bakur li ber çavan tê raxistin.

Helbestvana kurd Hêvî Berwarî di nivîsa xwe ya bi sernavê "Himbêzkirina jina kurd di nava şoreşê de" çêlî jinên ku di nava şoreşê de cih girtine û hê jî cih digirin kiriyê. Bavî Aran li ser Yekemîn Festîvala Şanoya Kurdî li Derveyî Welat nivîseke nûçeyî pêşkêş kiriyê. Di vê nivîsê de li ser festîvalê xwendevan tene agahdarkirin. Ev nivîs bi zaravayê soranî ye.

Nivîseke din a analîzî ku di nav rûpelên vê hejmarê Avaşîn de cih girtiye, ji hêla M. Elî Tüysüz ve hatiye nivîsandin. Tüysüz di bin sernavê "Li Bakur Daxwaza Dewleteke Federatîf" de mijara daxwaza stratejîk û taktîkî hildaye dest û balê

dikişîne ser nakokiya xebat û gotina tevgera kurd. Li gorî wî rêxistinên kurd xebata xwe ji bo Kurdistaneke serbixwe dimeşînin, lê di gotinê de qala hinek tiştên mîna federasyon û otonomiyê dike. Ev yek jî nakokiya navborî derdixe holê. M. Elî Tüysüz di dawiya nivîsa xwe hinek agahî li ser Kurdistana Federal jî pêşkêş kirine.

Di nava vê hejmarê Avaşîn de beşa yekemîn a du romanên jî cih girtiye. Romana yekemîn ji hêla Xurşîd Mîrzengî ve hatiye nivîsandin, navê wê jî "Bircên evîne" ye. Romana duyemîn jî berhema Alê Biyanî ye û navê wê jî "Bojena" ye. Rêzenivîseke ku di vê hejmarê de berdewam dike jî nivîsa Îsmail Beşikçi ya bi navê "Li rojhilata navîn terora dewletê" ye. Di vê beşa nivîsê de li ser "Çawaniya Biryarnameya siyasî û civakî" hatiye rawestandî.

Kurdên Anatoliya Navîn van demên dawîn gelekî balê dikişînin ser xwe. Di vê hejmarê Avaşîn de "Hevpeyvîn" a ku Şoreş Reşî digel Mele Hemiyê Kor ê 110 salî kiriyê bo nasîn çand û dîroka kurdên vê herêmê girîng e.

Nivîseke din ku divê mirov qalê bike, li ser Osman Sebrî ye. Mehmud Lewendî digel hevdişîneke xwe ya bi Osman Sebrî re hinek agahî li ser jînenîgariya wî jî dane. Ji bilî van nivîsan gelek nivîs û helbestan di nava rûpelên kovarê de cih girtiye. Ji van, nivîsa Amed Tigrîs a bi navê "Suffiksên kurdî" jî bo kesên ku serê xwe di ber gels û gelemşeyên zimanê kurdî de dişînin pir girîng e. Her wekî jî sernav jî diyar e, Tigrîs di vê nivîsê de paşgirên kurdî hildane dest û digel gelek mînakên wan bi xwendevanên kovarê dide nasîn.

SERWÎSA ÇENDÊ

## Meşa karmendan li Enqereyê

Q. DÊRSILAVÎ

Di 12.02.1999 li hev civiyan. Wan yeko yeko cihê xwe di otobûsan de girt. Di niv saetê de deh otobûs tîjî bûn.

Piştî ku saeta birêketinê hat, otobûs bi rê ketin. Lê dizanibûn ku çî li pêşiya wan e; dê piştî deh-panzdeh kilometreyan rîya wan ji hêla polisên dewletê ve were birin, nasnameyên wan yeko yeko bi hûrbîni bê raçavkirin û nivîsandin da ku cureyên cezayan li wan bibirin. Lê derdê xwepêşandêran ne nivîsandina nasnameyê û ne jî cureyên cezayan bûn. Tiştê ku jê fikar dikirin paşdemana mîtingê bû. Dê biçin paytexta Tirkîye Enqereyê beşdarî mîtingê bibin, biqîrin, bibarin, cureyên dirûşmeyan biqîrin da ku kul û kederên hezar salan der bibin. Bi kêf laqirdiyan serê otobûsan berdan.

Li perê bajêr polisên ew bi qederê du saetan dan sekinandin û nas-

nameyên wan yeko yeko nivîsandin. Hinekî dereng ketibin jî xem nîn e. Jixwe hesabê vê yekê kiribûn. Lê astengiyên ku li Rihayê derketin pêş wan ne di hesab de bûn. Talûkeya negihîştina mîtingê hîn jî zêde bûbû. Vê yekê ew gelek zivêr kirin. Yek ji wan yek ji polisên tiştêk nexistin serê hev. Piştî telefonkirina Enqereyê tu tişt çareser nekir. Polisên ew digot: "Emê yeko yeko li nasnameyên we gişan bikolin ka gela mirovên mahkûm û qaçax di nav we de hene an na. Vê yekê dê bi kêmanî sê-çar saet bigirta û edî ne mimkûn bû ew bigihêjin mîtingê. Wan jî digot: "Jixwe li perê Amedê nasnameya me tevan hatiye oxulmekirin û nivîsandin.

A duyemîn jî em tev karmendên dewletê ne ne gengaz e ku em mirovên lêgerînê bin. De destûra me bidin da ku em bigihêjin mîtinga

xwe." Piştî ku çend nasname hatin oxulmekirin dîtî ku her yek ji aliyekî ve bi ser wan de diqire û wan rexne dikin. Polisên hew xwe ragirt mecbûr man ku destê xwe lez bigirin, karmendan bi rê bikin. Li vir jî nêzî saetekê wext li wan çû. Îcar wan bi dilekî rihet serê otobûsan berdan û wiha got: "Xwe bigire Enqere em hatin, emê te bihejin" digel van astengiyên jî tu kêmanî nekete morala wan, ji kêf û şahiya wan tiştêk kêmanî nebû. Ji serî heta dawiyê, rêwîtiya xwe tim bi dilok, kilam, helbestan bihurandin. Carinan li ser rojevê, carinan li ser hilbijartina nêzik, carinan li ser pêşerojê nîqaş û şirove hatin kirin. Divê mirov para ajoyekî hêja (ku min navê wî nepirsî) ji bir neke. Zilamekî gelek qenc û hêja bû. Li gorî dilê karmendan bû.

Îcar li devê deriyê Enqereyê rê hate

birin. Dîsa oxulmekirin. Vê carê jî polisên berê xwe da pankart û afîş û darikên wan. Tiştê ku jê inatandin resmî şehîdên karmend bûn. Ji ber ku ew şehîd bi destê polisên wê herêmê nehatibûn kuştin, wan digot ka ew hinekên din in. Çendek jî wan hatin desteserkin, lê dîsa ji morala meşvanan xera nebû. Ji ber ku gihîştibûn Enqereyê kêf û çosa wan zêdetir bû. Piştî vê yekê jî rastî dek û dolabên rayedarên sendikayê hatin. Ji bo dengê Kurdîstaniyan bilind dernekeve, ew jî hev hatin belav kirin. Her wan her komek da aliyekî, lê dîsa kurdîstanî li Meydana Sîhiyeyê gihîştin hev bi pankart û sloganên xwe Enqere hejand. Listikên kemalîstan bi avê de çûbûn. Divê mirov heqê ciwanên şoreşger ên tirk jî ji bir neke, wan jî li gorî hêza xwe alîkariya kurdîstaniyan kir.

Belkî kurdîstaniyan tiştêk bi dest nexistibû, lê tiştê ku nedikarin li welatê xwe yê bindest bikin kiribûn û gir û kîna xwe qiriyabûn. Ev yek jî rewşa wan a li vegeerê jî xuya dibû; bûbûn wekî rêsiyê felîşandî.


# Nîsk û birûsk Trêna reş û dirêj

**M**irovekî gundî keda xwe ya salekê tev dide hev û pê ji xwe re nîskan dikire û diçîne. Bihar tê nîskên wî şîn û geş dibin. Êvareke biharê tey-roka pir xurt dibare. Gava gundî vê yekê dibîne, pêxas û tenikhal berê xwe dide çolê. Ji ber ku tarî ye ew ber xwe nabîne, her ku birûskê vedide deh gavan bi pêş ve dibeze û disekine. Bi vî halî diçe heya ku deh gav bi zeviyê dimîne û birûskê dî hew vedide. Li ser vê yekê mirovê gundî hêrs dibe û berê xwe bi jor de dike û dibêje:

– Min xwe disparte te, te li min wiha kir, qet nebe birûskeke din vêxe, ez binêrim ka te gûyek hiştiye yan na.

## Mirovê xizan

Mirovekî xizan bêçare dimîne û diçe serê girekî pir bilind da ku nêzî Xwedê bibe. Li ber Xwedê digere û dibêje: “Xwedeyo ez bêçare mame, tu karê ku ez bikim nîn e, derî tev li min hatine girtin. Min divê ku tu hin pereyan bidî min.” Navê pêxemberan gişan rêz dike û lava û dua dike, lê tu tiştî bi dest naxe. Bêçare berê xwe dide malê, ji nişka ve lingê wî bi ber keviyekî dikeve, li ser deverûyan dikeve erdê û heta xwarê di-



gindire. Di halekî xerab radibe ser xwe û dibêje: “Erê tu nadî, ji ber çî tu mirov dehf didî?”  
FAYSAL STÛRKAZER

**Y**eki Hilêlikî (Hilêlikê li Başûrê Biçûk gundekî nêzî Qamişloke ye) keriyê mihan dibe ber şîva trêne çêriyê. Mihên wî li du rexên şîva hesin belav dibin û biaramî diçêrin. Danê nivro neh-deh mih derdikevin ser şîva trêne, serê xwe dixin bin zîkê hev û din... bi komikî radiwestin. Trên ji nişka ve tê û tûşî mihên li ser şîva hesin dibe û wan dipelixîne, dikeve.

Êvarê gundî û cîranên wî yeko yeko tên serxweşiya wî. Li ber dilê wî digerin û dibêjin:

– Gelek tade li te hat... bila serê te û zariyên te sax bin. Ferman ji Yezdan wiha bûye, betal nabe... Mêrik dibêje:

– Elhemdila, ma ku bûyer hîn mezintir bûya?

Cîranekê din... yekî din... û yekî din tê giş dibêjin: “Derbasbûyî be!” Ew her tim bi heman şeweyî li wan vedigerîne: “Bila ji Yezdanê dilovan pê ve kes nebêje ez didim û ez distirînim. Îro ew li min hate rehmê. Keriyê miha ji bobeloteke mezin xelas kir... Xwedê kir ku ev bû. Ne mezintir bû.

Li ser vê yekê cîranek xwe ranagire û dibêje: “Pismam trêna tîrko tûşî nav keriyê te bûye... deh mih kuştine, îcar bobelota mezintir çî ye?”

Ew trêna reş û dirêj tê ber çavên wî û dibêje: “Erê Yezdan ez ji bobeloteke mezintir riha kirim. Trên bi serî ve dihat deh mih kuştin. Ma ku ... devê min nagere ku bibêjim. Ya rebî star bi te ye.” Yên ku hatibûn sersaxiya wî dibêjin: “Bila devê te bigere... bibêje... rave bike ku em ji bizanin.” Mêrik di perosiyeke mezin de bû. Dengê wî diricifî... got: “Xwedê kir ku trêna bi serî ve dihat, ma ku termikî (tatikî) bihata... weleh tevî kûçik yek ji wan sax nedihîşt.”

BRO OMERÎ

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (162) XAÇEPIRSA

Alfabet	A	B	C	D	E	F	G	H	I	J	K	L	M	N	O	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
Alfabet	A	B	C	D	E	F	G	H	I	J	K	L	M	N	O	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z

Mebûse kurd (wêne) Ard	Kêfxwes Cînavkeke şanidanê	Sembola Hidrojenê Hew	Emir Tîpa berî Şyê	Kobari İsm	Wekok
1			Navekî jînan	7	
Partiya kurdan		4	...pêkuti		
Pêşgîrek	Ajneber Kurteya bijîşk		Kesên ji malê Kulilkek		
Mehek	Wexta darbirinê Hêsan		2	Bi kirdkî ben	
		5	Sembola Talyûmê Sembola Wolframê	Keleşer Zarokxane	6
Sembola osmiyûmê Bi tirkî dar	Cureyeka mîşmişan		Veqetandi kik Sembola oksijênê		
			Dijberê kevin	Dareke bi fêkî	
Dijberê birinê Qertafa tewangê			Cînavkek		
	Maske		3		

**Bersiva Xaçepirsa 160'î**

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hej-mara me ya 162'yan, pirtûka Siyahpûş “Çend xezel û helbest” e.

**Siyahpûş Çend Xezel û Helbest**

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

# Adirê azadiyo beno berz


Öcalan wexto ke Enqere de çebiyeno girotxane wija xo bi xo vatibî: "Lazim o ke ez winî jû partî ronî ke, tasfiyekerdinê ci bêimkan bo". Bi rastî jî winî kerd. Partiya ke ronaya tasfiyekerdinê ci bêimkan o.

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan Kenya ra Tirkîye remnayin peyra, serdarane dewleta tirk fina zey verî karûbarê xo virada û iyê qedayinê PKK anê ziwani. Televîzyon û rojnameyanê tirkane jî zey serxoşina serkewtinê kêf kenê û Tirkîye ardinê serokê PKK Öcalanî, zey qedayinê PKK hesabnenê.

Qedayin û neqedayin iyê nezdi de bivîne, zey finan verinan. Ma musayeyê nê vatenanîm. Çi ke hetanî nika dewlet çimhal dest çekerd jew operasyonî, hema qedayina PKK ard ziwani. Nika iyê fina qedayina PKK anê ziwani û Tirkîye remnayinê Öcalanî zey serkewtinê nîşan danê. Feqet çeçeko vizêrfino jî, rind zano ke Tirkîye remnayinê Öcalanî serkewtinê Tirkîye niyo. Tirkîye remnayinê Öcalanî

wasten û hetkarîna Amerika ser virazyayo. Serdarane dewlet, giştî Amerika eşkera nêbo jî qebûl kerdî.

Serokê PKK Abdullah Öcalan nika esîr kewt û oyo dewleta tirk dest de wo. Eke serdarê dewleta tirk û aqildayoxê ci (Amerika û Îsrail) kor û ker niyê, iyê paywerîştinê şarê kurd bivîne. Xora eke mewazê bivîne û zey hetanî nika ker û korina xo dewam bikirê, estîna şarê kurd mesilasnê, şarê kurd o xo pirodayina bido silasnayin. Şarê kurd hetanî nika tim û tim wast estin û haqane xo raya demokrasî û siyasiya bido qebûlkerdin. Qandê na ray hetanî nika ci dest ra çiçi ame kerd. Feqet dewlet û aqildayoxanê ci, no niyetê kurdano rind nêdi û kompoyana amey kurdan ser. Iyê wazenê riyê dinyay kurdan rê bikirê cehnem û bê PKK û bê



Öcalanî bikiwê seranê di hezaraninan (2000).


Ezo wazena tiya jû vatena Öcalanî biyarî ziwani. Öcalan wexto ke Enqere de çebiyeno girotxane wija xo bi xo vatibî: "Lazim o ke ez winî jû partî ronî ke tasfiyekerdinê ci bêimkan bo". Bi rastî jî winî kerd. Partiya ke ronaya tasfiyekerdinê ci bêimkan o. Ancî Öcalanî xo çend finî vat: "Hinî ez bibî jî, çinêbî jî qe xem niyo, çimke mi winî jû partî ronê ke, a partiya bibo partiya azadikerdina şarê kurd".

Rast o! Partiya ke Öcalanî ronê Amerika senî kerd nêşa tasfiye bikiro. Coka jî Amerika ya ewro partiya Öcalanî zey partiya tererîstan û Öcalanî jî zey sertererîst nîşan dana û Kenya ra Tirkîye remnayina jî, wazena Öcalanî ra heyfê xo bi-

giro. Çimke ewro bê partiya Öcalanî keso nêşeno vera politikanê Amerika bêro. Amerika ya sera 1991 ra, na kişt wazena Rojhilatê Miyanî xo dest fino û politikanê xo yê seranê di hezaraninan ray fino. Qandê nê politikanê seranê di hezaraninan rayfistin Filistin, Iraq, İran, Suriye û dewletê binî tam nêbo jî ardî ray, feqet PKK û serokê ci Abdullah Öcalan nêşa biyaro ray û goreyê politikanê xo yê di hezaraninan bixafino. Coka jî serokê PKK Öcalanî rê kompo viraştina da dewleta tirk dest. Peynî de Öcalan esîr kewt feqet adirê şerê azadiyo verî ra rind û weş veşeno û qe keso jî nêşeno nê adirê hewna bikiro. Oyo ke wazeno nê adirê hewna bikiro oyo xo tede veşeno.

MEMED DREWŞ

## TÎJ



LERZAN JANDÎL

## Ravêr!

Remnayena birêz Öcalanî ebi korsaniye, dîroka me de biye destikerdena demêde neweyî. Sebeta ke na remnayene ser ro zaf amê nivisnayene, ez na ca de nêwazena naye ser ro vinderî. La belê ebi sernivisan ez wazena ke tayê çiyân-seba diskusiyonê newiyan- kilm biyarê re ziwani/zon.

Dîroka ma de sereke ma:

Mîr Mihemed, Bedîrxan, Ubeydullah û eb ameyî koçberkerdene û nê koçberiyê de merdî. Şah Wuseyîn koçberiyê ra rema, pêyser amê Dêrsim. Serokê Koçgiriye pêro ebi exdam ameyî cezakerdene. La belê

tersê Dêrsimî ra hukmatî kemalistî ef vet. 1925 ra nat yanê Şêx Seidî ra nat serekê kurdan pêro ameyî dardekerdene. Çinay re? Çimke dewlete ere xo bawar biye, kirmancan ra xurtêrî û zimtêr biye. Kirmancî yan jî tevgera dînan qelse biye.

A. Öcalanî û pêguretene dê:

Sereketiya A. Öcalanî yê bînan ra cuda biye. Her çîra ver sereketiye de hemdemî ye, şarêde modern, organizasyonêde çep estbî û ewroj jî esto. Ebi na hêviye ma pêrine bawer kerdene, sereke ma naye ra dime ebi dek û dubaranê Tirkîye nêne kîştene. La belê ewroj politikaya dinya vuriye. Her çîra

ver Amerika û NATO hemverê azadiya ma wo. Ebi hetkariya Amerika û maşayanê dê zê Îsrail, Yewnanistan û Kenya pêguretene A. Öcalanî TC ye re biye nasib. La belê A. Öcalanî Şêx Said yan jî Sêy Riza niyo!

Naye ra tepiya se bikerime:

Her çî ma dest de ro. Yanê şarê ma, partiyanê ma, înstîtusiyonê ma dest de ro. Eke ma ere birêz A. Öcalanî rind wayir bivêcime TC nêşikîna ere dê çiyê bikero. Bêguman TC nê yew Mandela, ne yew Gandî wazena. Ma naye rind zanîme. La belê ganî ma armanc û hedefanê xo rind zelal bikerime, qewetanê xo rind seferber bikerime ke ma bişikîme A. Öcalanî guretîra yew A. Öcalanîde azad sey/zê Mandela, sey Gandî bivejêrime.

Ma ganî nê lêci her het ra bikerime zixm. Ha avêrberdena dostiyanê kanan, ha viraştina dostiyanê neweyiya, ha ebi karê dîplomasi, ha ebi tengkerdena hedef û dişmenanan û ha jî ebi averberdena lecê gerilayî ma ganî îmkananê xo pêrine rind, xeteyan ra azad, zelal û pak avêr berime.

Yanê Lecê ma hem welat de, hem Tirkîye de û hem jî dinya de/Ewropa de ganî ebi koordinasyonêde dewlemend, ebi

mordemanê bi qedaran û ebi formasyonêde newe tayîna bêro pêtkerdene.

Partî, organizasyon û înstîtusiyonê kurdan na rojê ra tepiya ganî yew bê. Leckerdene de, pêrodoyane de, armancanê şarê ma seba azadî û demokrasi de ganî ma yew bîme. Ebi xeta û kaprisanê kanan, kam beno wa bibo, ma nêşikinîme ravêr şime. Feyde naye ne ma re ne dostanê ma re ne jî şarê serê hardanî re esto.

Ma ganî ere qeweta şarê xo, potensiyalê şarê xo bi kilmiye ere xo bawer bîme. Ebi na baweriyê, ebi metodanê newiyan û hemdemiyân-yanê cawo ke ma ebi heq e me ganî neheq mebîme- şaran miyan de xo rê dostan pêyda bikerime.

Dadgehê/mehkema Tirkîya de parêznayena A. Öcalanî demêde dîrokî ya. No kar ganî zaf rind bêro organizekerdene. Hem Tirkîye de û hem jî dinya de ganî her kes balê xo bidêro na dawa. Vatena pêylene: Ganî ma sereketiya hemdemiyê-se beno wa bibo, çimke ewro sembolê kurd-biyên a- destê dismenî de tenya meverdimê.

Her çî destê ma de ro, de haydî bêters û ebi hêviyêde girse ravêr!

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212)  
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

■ Berpirsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım  
■ NIVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ  
(İrtibat büroları)

■ Amed:  
Tel: 0 (412) 223 34 83  
■ Mîrsîn  
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir  
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene

Tel: 0 (322) 351 42 78

■ (Nûnerê Giştî yê Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:  
İhsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07

■ Fransa:

M. Ali Doğan

Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika

I. Can

Tel:32 53 64 12 41

■ Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:

Jana Seyda

Helim Yüsiç

# KT ji kurdên alîgirê xwe jî aciz e

## Cîgirê serokê HADEP'ê Osman Özçelik:

**S**erdozgerê Komarê Vural Savaş ji bo ku beşdariya HADEP'ê ya hilbijartinê asteng bike, serî li Dadgeha Destûra Bingehîn da. Li aliyê din hikûmeta tirk bo Kurdistanê paketa aborî ragihand. Her wiha Partiya Fazîletê li ser kêşeya kurdî raporek amade kir. Li ser mijarên navborî û gelek mijarên din me digel Cîgirê Serokê HADEP'ê Osman Özçelik hevpeyvînek kir.

**Serdozgerê Komarê ji bo ku HADEP nekeve hilbijartinê serî li Dadgeha Destûra Bingehîn da û xwest ku HADEP'ê asteng bike. Bi vê pêvajoyê ve girêdayî hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

✓ Wekî tê zanîn HADEP'ê di hilbijartinê 95'an de milyonek 200 hezar deng girt. Piştî wê HADEP bihêztir bû. Xuya bû ku HADEP'ê di hilbijartinê 99'an de bi ser bikeve, dê ji benda %10'an derbas bibe. Bi taybetî li bajarên kurdan di hilbijartinê herêmî de dê bibe partiya yekemîn.

Vê rewşê bi taybetî bala kesên hêzdar û karîger kişand. Tirsaw wan ew e ku HADEP'ê li bajarên kurdan belediyeyan bi dest bixe û gel dê xwe bi xwe îdare bike. Ji ber wê Serdozgerê Dadgeha Destûra Bingehîn ji bo girtina HADEP'ê doznameyek amade kir. Li gorî vê doznameyê dixwest ku HADEP bê girtin. Sê sal berî niha dozgerê DGM'ya Enqerê îxbara HADEP'ê kiribû ku HADEP partiyake fermî nîn e, partiyake nehênî ye. Lewre girtina HADEP'ê xwestibû. Serdozgerê Dadgeha Destûra Bingehîn dosyaya HADEP'ê nexwend. Peyre li ser hûr bû û biryara xwe diyar kir û got: "Li gorî dosyayên ku hatine ber destê min, ez nikarim daxwaza girtina HADEP'ê bi cih binim." Ji ber ku tu delîlên hiqûqî di dosyayê de tune ne. Ev dosya sê salan li ser maseya serdozger ma. Du meh berî niha wî ev dosya ji nû ve vekir. Li gorî dosya ku berê vekiribû dozname amade kir.

Li gorî me daxwaza serdozger ne girtina HADEP'ê ye. Daxwaza wan ew e ku HADEP'yan û hilbijêrên wê bikin nava dudilî û tengasiyê. Di encamê de dengên HADEP'ê kêm bibin. Belê têgihîştin ku berî hilbijartinê HADEP nayê girtin. Lewre serdozger xwest doznameyê amade bike. Serî li Dadgehê da û xwest ku HADEP nekeve hilbijartinê. Di vê serlêdanê de du tiştan wekî hincet nîşan dida: Yek, berendam û rayedarên HADEP'ê dê bi riya çapemeniya nivîskî û dîtbarî cudaxwaziyê bikin. Diyar e ku serdozger ji ramanên me ditirse, ji ramanên me yê eşkere û eşkernebûyî. Dewletên hiqûqî bidin aliyekî di tu diktatoriyan de tu kes tu partî ji ber ramanên xwe yê eşkernebûyî nehatine tawanbarkirin û darizandin. Du, di daxwazna-

me ya din de diyar dike ku mîltanên PKK'ê li herêmê ji bo ku dengên xwe bigel HADEP'ê gefan li gel dixwin. Em dibêjin ger wisa be gel ne di nava ewlehiyê de ye, partiyên din ne di nava ewlehiyê de ne. Belê. Ev yek ne rast e. Eger rast be divê hilbijartinê bê taloqkirin, ne ku partiyek bê girtin an jî partiyek ji hilbijartinê bê kişandin. Bi qasî ku em zanin PKK gel tehdît nake berevajî vê hêzên dewletê gel tehdît dikin, ji bo ku ew dengê xwe nede HADEP'ê. Li gelek bajar û navçeyan berendamên me yê ku serî li saziyên dewletê yê hilbijartinê didin tene girtin û çewisandin.

**Parêzerên HADEP'ê serî li Dadgeha Destûra Bingehîn da wan û diyar kir ku berê li ber girtinê a**

**HADEP'ê di Destûra Bingehîn de tu rêz û rêçik tune ne. Dewlet li gorî kîjan rêz û rêçikan tevdiqere?**

✓ Tu hincetê hiqûqî di destê wan de tune ye. Belê, tenê dixwazina HADEP nekeve hilbijartinê. HADEP partiyake fermî ye, bi hezaran kesên berendamîyê serî lê daye. Hilbijartin û hilbijêrî mafên mirovan ên bingehîn in. Mafê tu kesî tune ku vî mafî bînpê bike. Em hêvîdar in ku dadgeh dê vê daxwazê red bike.

**Bi dîtina we pêkan e ku HADEP bê girtin. Ger bê girtin hûnê politikayê çawa bişopînin, hûnê li dijî hilbijartinê helweste çawa nîşan bidin?**

✓ Girtin û qedexekirin tiştê e, qedexekirina ketina hilbijartinê tiştê din e. Niha bo girtina HADEP'ê dozname amade bûye. Emê parastina xwe bi tundî bikin. Ev doz berî hilbijartinê naçe serî. Berî hilbijartinê astengkirin dij hiqûqiyê mezin e. Kes nikare ji bin vî barî rabe. Ger beşdariya me ya hilbijartinê bê astengkirin emê li hev rûn û bo pêşerojê helwesta xwe zelal bikin.

**Dewlet li aliyekî dibêje bo çareserkirina kêşeyê dawî li pêvajoya leşkerî hat. Her wiha hikûmetê paketa xwe ya aborî ragihand. Lê li aliyê din di warê qanûnî û rewşa hemû liv û lebatên kurdan as-**


**teng dike. Dewlet dixwaze çî bike?**

✓ Dewlet dixwaze kurdan bi tevayî bêtesîr bihêle. Ev yek dîtina kesên ku digor-

xwîn û xwêdana kurdan bin parlamentêr.

**Politikaya we ya îtifaqê ya digel partiyên dijber çî ye. Çima di navbera we ÖDP û E-MEP'ê de lihevhatin pêk nehat?**

✓ Bi rastî me du dirûşmê bo xwe wekî bingeh girtin: Yek, bo kurdan yekî, du, bo kurdan û hêzên demokratîk îtifaq. Lewre jî me bi taybetî bi wan re têkilî danî. Me xwest di hilbijartinê de bi wan re îtifaqê pêk binin. Lê peyre em têgihîştin



tin: "Dewlet dixwaze bo kurdan gavan biavêje lê şidet dibe asteng" ji binî ve pûç dike. Îro cerdevan jî li derveyî listeteyên partiyên dewletê dimînin. Tahamûla wan jî cerdevanan re jî tune. Ne tenê kurdên xwenas û birûmet dewlet ji kurdên alîgirê xwe jî aciz e.

Paketên aborî yê dewletê paketên sextekariyê ne. Hetanî niha 56 hikûmet ava bûne. Hemûyan jî bo welatê kurdan paketên aborî vekirine. Lê yek jî neçûye serî. Ev, paketên xapandinê ne, paketên înkâr û pişaftina kurdan in. Kurd ne hewceyî paketên aborî ne. Ji bo kurdan berî her tiştî jiyaneke mirovane û azad divê.

**Wekî tê zanîn partiyên tirk dema ku hilbijartinê nêzîk dibin, li ser kêşeya kurdî raporê amade dikin. Partiya Fazîletê jî vê dawiyê raporek amade kiriye. Dibêje: Divê nasnava kurdî bê naskirin; perwerdeya kurdî û weşanên kurdî bêne serbestkirin. Hûn der barê vê de çî difîkirin?**

✓ Partiyên dewletê tev yek in û li ser şopa îdeolojiya fermî ne. Îdeolojiya fermî jî li ser înkarkirin û pişaftina kurdan hatiye lêkirin. Lewre jî gotinên wan tu car hêviyê nadin gel. Wan tenê çavên xwe berdane dengê kurdan. Her wisa hin kurd jî ketine kozîkê û li benda girtina HADEP'ê ne. Ger HADEP bê girtin dê li ser

ku hîn haya wan ji mezintiya kêşeya kurdî nîn e. Janê nedaye dilê wan. Lewre jî bi wan re îtifaq li dar neket.

**Bi taybetî ÖDP'ê digot bila HADEP tekeve bin banê me, hûn vê helwestê çawa çawa dinirxînin?**

✓ Dewlet ÖDP'ê bi zaneyî derdixe pêş û dînepixîne. Di hilbijartinê de wê xuya bibe ku ÖDP dê %1'ê dangan jî negire. ÖDP dibe ku hinekî ji CHP'ê cuda xuya bike lê di dawiyê dawîn de wekî hev in. Dixwaze em tekevin bin baskê wan. Lê banê wan teng e, em tê hilnayên. Me jê re got werin di bin banê HADEP'ê de bikevin hilbijartinê. Lê wan nepejiran. Ez bawer im piçekî tirsandina dewletê bandor li wan kiriye.

**Niha rewşa HADEP'ê çî ye. Piştî 18'ê avrêlê hûnê encameke çawa bigirin?**

✓ Bi dîtina me di hilbijartinê herêmî de HADEP'ê li bajarên kurdan bi ser bikeve. Hêzeke mezin dê derkeve holê. Di hilbijartinê parlamentoyê de jî ez bawer im emê ji benda %10'an derbas bibin. Îro li gorî lêgerînên dewletê yê fermî hêza me li dora %7,5 an jî 8'an dixuye. Ez bawer im heke hilbijartin di mercên hinekî demokratîk de pêk bê emê ji %10'an zêdetir deng bigirin.